

## Barzanî: Vegerin pêvajoya aşitiyê

Şer û pevçûnên ku li Bakur despêkir û bûn sedema mirina gellek sivîlan bandoreke neyênî li Herêma Kurdistanê jî dike. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ji bo rawestandina şer û pevçûnên li Bakur bang li aliyan kir û daxwaza berdewam a proseya aşitiyê anî ziman. Barzanî di daxuyaniya xwe de ji bo malbatên kesên ku di bûyeran de jiyana xwe ji dest dan hêviya sebr û sersaxiyê kir. R04-5


# BasNûçe

HERDEM RASTÎ

Rojname ya heftane ya nûçeyî - 2.5 TL Hejmar: 70 14 - 20 Îlon 2015 basnews.com




## "Vekhevîya li sengeran divê"

Endama Meclîsa Bilind a Jinan Emel Celal di derbarê xebatên jinan ên li Başûrê Kurdistanê de pirsên BasNûçe'yê bersivande.

R08-9


Welat R10-11
Sonqor

Kirmanckî R12
"Birayiya hezar serrane"

Dîrok R13
Destpêka biratî û Tirkiyeyîbûnê!

Wêje R15
Bi pênûsa kurdekî jinên kurd




Tirkiye:

# Reşetariya nîjadperestiyê

Piştî qeyrana ku bi hilbijartinên Hezîranê rû da û rewşa bêhikûmetiyê, pêvajoya nû ya şer ber bi rewşeke dijwartir ve diçe û vediguhêze êrîşên komelî yên li dij kurdan. Ev bûyerên ku li Tirkiye'yê destpêkirin, di heman demê de arasteyî Ewropa'yê bûn. Li Elmanya, Fransa, Swêd û Swîsre di navbera kurd û nîjadperestên tirk de pevçûnan rû dan û di van pevçûnan de gellek kes birîndar bûn.

Çavdêrên siyasî ku ev êrîşên dirinde yên ku li dij kurdan pêk tên wek nêzîkbûna şerê navxweyî û bi têgehkirina 'Şevereşa Tirkiyeyê' dinirxînin, bi bîr dixin ku Holocaust'a ku Almanên Nazî li dij cihûyan pêk hanî jî bi ev şêwe êrîşan destpê kirine û vê hişyariyê dikin: "Ger ku ev şer neyê rawestandin, egerî heye ku kontrola bûyeran ji dest here û felaketên mezintir rû bidin". R02 - 03

Portre

## Dr. Şerefkendî

Dr. Sadiq Şerefkendî ku di sala 1992'yan de Sekreteriya Giştî ya PDK-Î'yê dikir, di 17'ê Îlona heman salê de, li Berlîn'a paytexta Elmanya'yê di restoranta Mykonos de li gel 3 hevalên xwe ve ji alî sîxurên Îranê ve hat kuştin. R14



Rojava:

## Siyasî bi hev dikevin, gel bi rêyan dikeve!

R06-7



Yekbûn:

## Ji bo mûzîkê hez û dilsozî divê

Muzisyena navdar Yekbûn di derheqê xebatên xwe yên hunerî, jiyan û plansaziya xwe û herwiha di derheqê rewşa muzîka kurdî de bi BasNûçe'yê re axivî. R16

www.arşivakurdî.org

# Li Tirkiye'yê reşetariya nîjadperestiyê

Piştî qeyrana ku bi hilbijartinên Hezîranê rû da û rewşa bêhikûmetiyê, pêvajoya nû ya şer ber bi rewşeke dijwartir ve diçe û vediguhêze êrîşên komelî yên li dij kurdan. Ev bûyerên ku li Tirkiye'yê destpêkirin, di heman demê de arasteyî Ewropa'yê bûn. Li Elmanya, Fransa, Swêd û Swîsre di navbera kurd û nîjadperestên tirk de pevçûnan rû dan û di van pevçûnan de gellek kes birîndar bûn.

Çavdêrên siyasî ku ev êrîşên dirinde yên ku li dij kurdan pêk tên wek nêzîkbûna şerê navxweyî û bi têgehkirina 'Şevereşa Tirkiyeyê' dinirxînin, bi bîr dixin ku Holocaust'a ku Almanên Nazî li dij cihûyan pêk hanî jî bi ev şêwe êrîşan destpê kirine û vê hişyariyê dikin: "Ger ku ev şer neyê rawestandin, egerî heye ku kontrola bûyeran ji dest here û felaketên mezintir rû bidin".

Qeyrana siyasî ya ku piştî hilbijartina 7 hezîranê li Tirkiye'yê rûda bû berdewam dike. Her wiha wê qeyranê teşeyeke nû wergirtiye û bûye êrîşa ser kurdan. Li gor serçaviyên HDP'ê ji ber êrîşên komên nijadperest ê li gelek navçe û navendan avahiyên HDP'ê jî din av de 400 cih û war hatine şewitandin û dikanên gelek esnafan hatine rûxandin. Her wiha li Stenbolê ciwanê ji Batmanê yê bi navê Osman Bektaş ni hinceta axaftina kurdî ji aliyê komên faşist ve hat qetilkirin. Li hêla din gelek mirov jî ji ber êrîşên van koman birîndarbûn. Li navçeya Fethiyê ya Muğlayê jî karkerê bi navê Îbrahim Çay rastî êrîşa cînarên xwe hat û bi zorê peykerê Atatûrk bi wî dan maçîkirin. Navenda Giştî ya HDP'ê û gelek nûertiyên wê hatin şewitandin. Gelek karkerên demkî yên li navçeya Beypazariya Enqerê bûn ji ber êrîşan birîndar bûn. Ji ber van bûyeran dikanên gelek esnafên Antalya û wê herêmê hatin şewitandin. Li Manavgatê dîsa ji ber êrîşa komên nijadperest esnafê bi navê Mehmet Acar hat kuştin û gelek kes jî birîndar bûn. Li Bursa û Balikesîrê jî di navbera hin komên faşist û kurdan de pevçûn derket. Li Stnbol û gelek bajarên din endam û komên bi ser MHP, koma bi navê Osmanli Ocakları, kemlîst û nijadperest bi hinceta şermezarkirina çalakiyên çekdarî yên PKK'ê û bîranîna leşker û polîsan derketin kolanan û dirûşmeyên "tolhildan" bilêv kirin. Li ser Hevserokê HDP'ê Sellahatin Demîrtaş ji ber daxuyaniya "Em ê mafê xwe yê parastina bi cih bînin" doz hat vekirin. Welatên rojava û DYA'yê daxuyanî belav kirin » dan zanîn ku ji ber van bûyeran ew bi fikar in. Serokê RHK'ê jî bang li herdu bereyan kir û da zanîn ku divê rêya diyolgê dîsa bê vekirin.

Herwiha pêvajoya çareseriyê ya ku ew 4 sal in di rojêvê de ye bi bûyera ku li Oremarê rû da û 16 leşker, bûyera ku li Îdirê rû da ya ku 14 polîsan jiyana xwe jidestan û rewşa awarte ya li Cizirê ku nêzikî 20 kesan jiyana xwe ji destdan, Tirkiye ji nûve zivirî atmosfera salên 90'î. Li Cizîra Botan 8 rojan qedexeya derketin derve hat ragihandin, li kuçe û kolanan şerê dijwar pêk hat û çekên giran xanî, dikan û bajar tev de hat wêrankirin. Herwiha şandeya HDP'ê ku ji wezîr û parlementeran pêk dihat jî tevî hemû hewldanan nikarî ku bigihîje bajêr û gelê bajêr bi rojan bi birçîbûn, nexweşî û mirinê ve rû bi rû ma. Zarok, û ciwan, kal û pîran jiyana xwe ji destdan, termên kesên ku hatin kuştin bo ku xira nebin di sarincan de hatin ragirtin, nexweşxane, dibistan, dikan, firin û hemû cihên girîng ên jiyanê girtî man. Piştî ku qedexeya 8 rojan bi dawî bû jî encama rewşa awarte derket holê. Bi sedan birîndar, bi dehan qurbanî, bi sedan kesên seqet û ziyaneke mezin a aborî...

Tevî hemû geşedan û xetereyan ne ji aliyê PKK'ê ve û ne jî ji aliyê dewletê ve tu agahiyek zelal a ku sedema şerkirinê ya ku gel qanî bike nehat dayîn. Bûyerên ku piştî qetliyama Pirsûsê û ragihandina xwesereyê destpêkirin meriv dikare bibêje ku Tirkiye û bajarên Kurdistanê bi gelemperî ketin tarîtiyeke bêhempa û ji hev qetîna civakê êdî gihîşt asteke ku ti hêz nikaribin weke berê nêzî hev bike.

Buyereên li Tirkiyê rû dan tesir li Ewrûpayê jî kirin û di nava çend rojan de li weletên weke Fransa, Almanya, Îsveç, Îsvîçre di navbera kurd û komên nijdaperest de pevçûn derketin. Ji ber van çalakiyan gelek kes birîndar bûn. Polîsên Isveçê jî dan zanîn ku eger ew êrîşî komeleyên kurdan bikin ewê wan ji welêt derxin û bişînin Tirkiye'yê.

Çadêrên siyasî vê rewşa aloz a siyasî weke pengava şerê navxweyî bilêvkirin. Her wiha çavdêr amaje bi wê yek jî dikin ku e bûyer êrîşên Holocaost yên faşîstên alman ê li ser cihuyan bibîrdixe û eger rê li ber van êrîşan neyên girtin ew ê qeyran belav bibe û ew ê tu kes nikare rê li ber bigre.

### Ji sedi 68: Bila operasyon bidomin

Rewya asayî ya ku ew 4 sal e didome ya ku ji aliyê ji sedî 90 welatiyan ve tê piştgirîkirin, piştî hilbijartinan ji nişkê ve serûbinî bû. Wek tê zanîn di pêvajoya ku weke Pêvajoya Çareseriyê, an jî muzakereyan tê bi navkirin, li gor dewletê bi sedema ku PKK ji Tirkiye'yê venekişî û sozên dayî bi cîh nekirin û li gor PKK'ê jî dîsa bi hemar sedemê ku dewletê sozê dayî bi cîh nekirine têk çû. Di vê navberê de beriya hefteyekî anketeke ku 70 hezar kes beşdarê bû hate kirin. Di çarçveya anketê de pirsa, "gelo bila li hemberî PKK'ê operasyonên leşkerî firehtir bibin an na?" hate kirin. Di anketê de encamên balkêş derktên. Li gor vê ji sedî 68 kesî bo vê pirsê denge 'erê' bikaranî. Herwiha di çarçoveya heman anketê de pir û encama din a balkêş jî ew bû: Hun dixwazin ku di rewşa heyî de zarokê we biçe leşkeriy yan na? Her wiha bo vê pirsê jî ji sedî 78 kesan dengê 'na' bikaranî. Ew jî tê wateya ku herkes dixwaze ew şer mezin bibe lê kes kurên xwe neşîne leşkeriyê. Herwiha tevî vê rastiyê piştî bûyera Îdir û Oremarê hemû bajarên Tirkiye'yê zivirîn qada şer û berdêleke mezin hat dayîn.

Bi hezaran kesên ku li hemû bajar û navçeyên Tirkiye'yê daketin kolanan û bi hêrs tevgeriyan êrîşî her kesên ku egeriya ku kurdbin hebe kirin, bi sedan kargeh hatin şewitandin û zêdetirî 400 êrîş li ser HDP'ê pêk hatin. Li Kirşehîrê dîmenên bûyera Madimakê rû dan, li Enqere'yê karkerên kurd rastî lîncê hatin, li Stenbolê ciwanekî ku bi mobaîla xwe bi kurdî diaxivî hat kuştin û Antalya'yê karkerekî kurd hat lînçkirin û bi darê zorê peykerê Atatürk bi wî hat ramûsandin.

Erîş û lîncên ku piştî bûyera li Oremarê ku 16 leşkeran jiyana xwe ji dest dan û bûyera Îdirê ku 14 polîsan jiyana xwe ji dest dan rewşeke ku civaka Tirikye'yê gelek caran pê re rû bi rû maye qewimîn û encamên wan anîn bîra herkesî. Otobosên ku ber bi bajarên Kurdistanê ve diçin rastî êrîşan hatin, kargehên ku ala tirkan neçikilandibin tev de hatin şewitandin û cînneta civakî li gelek cihan ber bi asteke tirsnak ve hilkişî. Li gelek cihan bi hinceta ku dişibin kurdan gelek kesên MHP'yî jî rastî êrîşan hatin.










### Ji Barzanî û Parlementoya Ewropa banga diyalogê

Li aliyê din Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî bi daxuyaniyekê bal kişand ser xeteraya heyî û da zanîn ku bi şîddet û çekan ti caran pirsgirêk bi temamî çareser nabin û tekanê rêya ku Tirkiye bigihîje aramiyê muzakere û diyalog e. Barzanî bang li herdû aliyan kur da ku şer rawestînin û yekser diyalog dastpê bike. Wekî din Parlementoya Ewropa jî bang li Tirkiye'yê kir da ku rêbazên xeternak bikar nîne û rê bide da ku şandeyên ne alîgir û xweser karibin li Cizîrê lêkolînan bikin.

Me jî wek malbata BasNûçe'yê bo ku em hem karibin bigîjin encama vê atmosferê û encamên ku eger heye biqewimin zelal bibin, me zêdehiya laperên xwe ji mijarê re veqetandin û tevî nêrînên hemû layenan me xwest meseleyê bi pîvanên rojnamegerî û vijdanî bînin ber xwînerên xwe.

### "Çareserî bi çekan ne pêkan e"

Di derbarê vê rewşa awarte de Parlamenê CHP'ê yê Stenbolê Mehmet Bekaroğlu anî ziman ku divê herkes hişê xwe bide serê xwe û banga aramiyê bike. Bekaroğlu got: "Kes nikare bi çekan tiştek bi dest bixe. Em li ser hemû tiştî dipeyivin, nîqaşan dikin û divê em dom bikin. Divê şer neyê domandin û dawî lê bê. Ger em tev bi hev re şer ranewestinin wê Tirkiye tûşî şerê navxweyî bibe, wê demokrasî û aboriya Tirkiyeyê şkestên mezin bixwe û wê aştiya civakî ji holê rabe. Wê kurd, tirk, alewî û sunneyên vî welatî ziyanê bibînin. Ev rewş zemîna rêgeha me dirûxîne. Divê ev şer bê rawestandin"

### "Armanc veqetandina gelan e"

Parlamenê HDP'ê yê Sêrtê Kadri Yildirim jî diyar kir ku tirsa Tirkiyeyê veqetandina kurdan e û ev rewşa awarte pêvajoya veqetandinê dide destpêkirin. Yildirim got: "Dewlet vê yekê bi destê xwe dike. Ev pevçûn derbeke mezin li vîna pêkvejiyanê xistiye. Dewlet rêbaza ku 30-40 sal berê pêk anîbû dîsa diceribîne. Tenê zatê qesrê rêya Tirkiyeyê dizane û tene daxwaziyek vî zatî heye û ew jî desthilatbûna AKP'ê ye. Hewl didin ku HDP'ê dibin bendê de bihêlin. Ger ku AKP bawer bike ku wê bi şer bibe desthilatdar wê şer bidomîne"

### "Armanc şerê navxweyî ye"

Parlamenta HDP'ê ya Edeneyê Meral Daniş Bektaş jî bi ser rûdanên Cizîrê AKP'ê rexne kir û angaşt ku armanca kuştina sivîlên li Cizîrê şerê navxweyî bû û hewl didin ku bi hilbijartinan AKP'ê bikin desthilatdar, dawî li aştî û demokrasiyê bînin û ji bo di nav gelan de pevçûn rû bidin tevdigerin. Bektaş got: "Lê belê em ê di aştiyê de israr bikin û ew ê negihîjin armanca xwe. Ew ê AKP nebe desthilatdar, çimku ev rêya çareseriyê nîne. Ev rê pêşî li ber mirina zêdetir mirovan vedike û dibe sedemê êş û azaran"

### "Ji azadiya gelan ditirsin"

Parlamena HDP'ê ya Stenbolê Emine Beyza Üstün anî ziman ku ji ber ji azadiya gelan ditirsin êrîşên xwe dijwartir dikin û ji ber vê yekê avahiyên HDP'ê dişewitînin û li Mêrsînê hevalekî me qetil kirin. Üstün got: "Em dizanin ku kî di nav van leystikan de ye û hemû raya giştî jî dizane. Li Cizîrê qetlîam pêk hat. Bi bombe û tangan êrîşî gel kirin"

### "Nêzikahiya hikûmetê nayê qebûlkirin"

Parlementerê MHP'ê yê Kayseri'yê Yusuf Halaçoğlu jî îddia kir ku ew mafdar in û ew rastî jî derketiye holê. Halaçoğlu wiha got, "Yekî wekî Bülent Arınç jî qebûl kir û anî ziman ku MHP mafdar e. Ma welat diçe ku, diçe nava tarîtiyê. Ber bi şerê navxweyî ve diçe. Hikûmet jî dibêje 'PKK li gel niyeta me ya baş her deran bi bombeyan dagire' belê raste lê bavê min hun heta niha li ku bûn we çi dikir. Hun dê peymana Dolmabahçe'yê li ku bi cîh bikin. Ew dê vê meseleyê çawa zelal bikin. Ew hikûmet vê nêzikahiyê ti caran nikare rê li ber teror û şîddetê bigire û welat derxe asta asayiyê."

### "Tekane rê aqlêsilim e"

Parlementerê AKP'ê yê Batmanê Ziver Özdemir jî di derheqê mijarê de nêrînên xwe bi me re parvekir û wiha got, "Divê herkes li hemberî şîdetê be û şîddet ji aliyê kê ve bê kirin divê herkes dijberiya vê yekê bike. Êrîşên ku li Oremar û Îdirê qewimîn û herwiha bi sedan bûyerên ku berê jî rû dabûn bi ti awayan nayê qebûlkirin. Divê tavilê ew êrîş bi dawî bibin. Ew xirecîra şîddetê divê di cî de bê rawestandin. Tu fêydeya şîddetê ji tu kesî nabe. Divê herkes bi awayekî aqlisêlim nêzikî mijarê bibe. Wekî din hedîseyên wiha bo kesên ku dixwazin arîşe mezin bibe weke fersendeke mezin tê bikaranîn. Bo vê jî divê herkes bi aqlisêlim tevbigere, di nava yekîtî û aştiyê de li hemberî şîddetê raweste.

### "Bo çareseriyê ramaneke wêrek divê"

Serokê Baroya Şirnexê Noşirvan Elçi jî anî ziman ku di encama bûyeran de hem di nava PKK'ê de û him jî di nava dewletê de bi sedan kesên kîndar li holê dimînin. Elçi wiha domand: Malbatên polîs û leşkerên bi nefreteke mezin nêzikî kurdan dibin. Ew mesele dibe sedem ku ew pirsgirêk ci çareseriyê bihore. Tu mafê kesekî nîn e ku welêt berv bi macerayeke ku encama wê ne diyarbe ve bibe. Tirkiye niha li wê qonaxê ye. Divê herkes ba wêrekî û bi dengekî berz bifikire.

### Encama ku pêk hat xeternak e

Di dawiya dawî de piştî 8 rojan Walîtiya Şirnexê bi daxuyaniyeke nivîsî dawî li qedexeya derketina kolanan anî û pêk ve şandeya HDP û partiyên din û rojnamegeran xwe gîhandin navçeyê. Herwiha di heman demê de hin kargeh, firin û nexweşxane jî hatin vekirin. Dîsa kesên ku jiyana xwe jidestdane hatin binaxkirin û rewşa navçeyê ya xeternak bir bi aramiyê vê birêket. Lê li gor dîmenên ku di çapameniyê de cîh digirin de xuyaye ku ziyana ku gihîştiye bajêr wê demeke dirêj bandora xwe bidomîne. Herwiha encamên siyasî jî di dîroka Kurdistan û Tirkiye'yê de weke lapereke reş bicîh bû.






www.arsivakurd.org

## Barzanî:

# Hêmanê serkeftinê yekîtiya neteweyî ye

Mehmet Salih Batırhan



Li Başûrê Kurdistanê li gel hemû bandora neyênî ya qeyrana ku heta niha nehatiye çareserkirin jî, Rêveberiya Herêma Kurdistanê (RHK), pengava operasyonên mezin ên li dij DAIŞ'ê bi serkeftî dimeşîne. Lê li alî din hat ragihandin ku şer û bûyerên ku li Bakur bûn sedema mirina gellek sivîlan bandoreke neyênî li Herêma Kurdistanê jî dike. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ji bo rawestandina şer û pevçûnên li Bakur bang li aliyan kir û daxwaza berdewam a proseya aşitiyê anî ziman. Barzanî di daxuyaniya xwe de ji bo malbatên kesên ku di bûyeran de jiyana xwe ji dest dan hêviya sebr û sersaxiyê kir. Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî, di serdana Balyozê Macaristanê yê li Iraqê Tibur Satrmari de di derbarê kêşeya penaberan a ku piştî dîmenê zarokê kurd Alan Kurdî yê ku di Deryaya Egeyê de fetisî û termê wî li peravê da, kete rojeva dinyayê de jî got ku şer û qeyranên ku li Rojhilata Navîn, li welatên Iraq, Sûriye, Yemen û Lîbyayê her roj dijwartir dibin, encamên wiha neyênî bi xwe re tînin û ji bo çareseriyeke mayînde ya vê kêşeyê bang li welatên rojava kir ku gavên berbiçav bihavêjin. Di hevdîtina bi Şandeya Enstîtuya Aştiyê ya Lindbergh a Amerîkî de jî Barzanî da zanîn ku DAIŞ tenê bi şerê çekdarî nayê rûxandin û got ji bo rûxandina wê pêwîst e di warê polîtîkî, aborî û bîrdozî de jî tekoşîneke baş bê kirin.

Di vê navberê de hemû partiyên Başûr bo kongreya AKP'ê hatin vexwendin û di beşdariya fireh de tiştên balkêş derketin pêş. Bêyî Goran hemû partiyan şandeyên xwe şandin kongreyê û herwiha Serokê Yekgirtû Alî Bapîr jî beşdarî kongreyê bû. Wek tê zanîn di mijara hilbijartina serokatayê de Yekgirtû bi YNK û Goran re tevdigeriya. Lê belê hatina wî ya li gel şandeya PDK'ê weke guherîn an jî nermbûna sekna wan hate nirxandin.

### Serokerkan: Barzanî ji bo çareseriyê amade ye

Li Bakur, piştî ku şer jinûve destpêkir û di serî de li Cizîr û gellek navçeyên din bi ragihandina 'xweserî'yan re qedexekirina daketina kuçeyan û ragihandina 'Herêmên 'Ewle', her wiha bi çalakiyên PKK'ê yên Oramar û Îdirê re kuştina gellek leşker û polêsan û di serî de navenda giştî ya Enqereyê, ji alî nîjadperestan ve talankirin û şewitandina gellek nûsîngehên HDP'ê û êrîşên dirinde yên li dij kurdên sivîl, rewşek awarte peyda bû. Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî diltengiya xwe ya li ser van geşedanan bi Serokerkanê Pêşmerge, General Cemal Mihemed re parve kir.

General Cemal Mihemed, di daxuyaniya ku da BasNûçeyê de da zanîn ku Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî metirsîdar e ku ev şerê di navbera PKK'ê û dewleta Tirkiyeyê ku li Bakurê Kurdistanê jinûve rû daye pêşi li dijwartirînbûna kêşeyê veke û diyar kir ku Barzanî amade ye ku ji bo çareseriyê tiştên ji dest wî tên bike. Mihemed, bi nimûnedayîna şerê navxweyî yê li Sûriyeyê re ragihand k ew şer bûye sedem ku bi milyonan mirov bikevin ser rêyan û penaber bibin û got: "Mesûd Barzanî jî ji encameke bi vî rengî metirsîdar e û daxwaz dike ku alî şer bidin rawestandin" General Mihemed piştî çalakiya PKK'ê ya Oramarê jî daxuyaniyek dabû û ragihandibû ku Hêzên Pêşmerge ketine rewşa alarmê.

### "Yên terorê dikin kart wê bi agirê terorê bişewitin"

Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî, şandeya Îmaratên Ereb ku ji Serokê Heyvasor a Îmaratê Muhemmed Atîk el Felahî, Serbalyozê Hewlêrê yê Îmaratê û hin rayedaran pêk dihat qebûl kir. Barzanî di vê hevdîtinê de diyar kir ku teror, xala herî grîng e ku ziyanê li mirovahiyê dike û li dij terorê pêwîstiya hevkariya navneteweyî destnîşan kir. Barzanî, balê kêşa ser hin welatên ku terorê wek kart bikar tînin û got: "Di axirîn demê de wê agirê terorê van welatan bişewitîne" Li ser navê şandeyê El Felahî jî ji ber serkeftinên siyasî û aborî yên RHK'ê pîroziya Emîrî Îmaratê Şêx Muhemmed Ziyad El Nehiyan pêşkêşî Barzanî kir. El Felahî, xebatên Dezgeha Xêrxwaziyê ya Barzanî yên ji bo penaberan şayanî pesndayînê nirxand û ragihand ku Heyvasor a Îmaratê amade ye ku alîkariya penaberên RHK'ê bike.

### 'Heta şer bidome wê kêşeya penaberan jî hebe'

Bi mebesta di derbarê perwerdehiya ku pisporên leşkerî yên Artêşa Macaristanê didine Pêşmerge û di derbarê pêla penaberan a ber bi Ewropa û Macaristanê de daxwaza alîkariyê bike, Serbalyozê Macaristan ê li Bexdayê Tibur satmari, bi Serokê RHK'ê re hevdîtin pêk anî. Di hevdîtinê de Barzanî, kêfxweşiya xwe ya berdewamiya dostaniya kurd û macar anî ziman û ji ber perwerdehî didine Pêşmerge, spasiyên xwe pêşkêşî gel û hikûmeta Macaristanê kir. Barzanî, di derbarê koçe penaberan a Ewropayê de jî got: "Ji bo rawestandina vê koçê, pêwîst e welatên rojava alîkariya welatên cînarên Sûriyeyê bikin da ku bi milyonan penaber di bin xeteriyan de nekevin rêya Ewropayê"

### Enstîtuya Aştiyê ya Amerîkî Barzani agahdar kir

Şandeya Amerîkî ya ku di bin serokatiya Serokê Enstîtuya Aştiyê Nancy Lindborg piştî lêkolînên xwe yên di derbarê rewşa penaberên RHK'ê, ji bo agahdarkirinê serdana Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî kirin. Di vê hevdîtinê de li ser pirsên şandeyê yên di derbarê teror û rewşa penaberan de Barzanî anî ziman ku tenê şerê çekdarî nikare terora DAIŞ'ê rawestîne, ji bo bi tevahî ji holê rakirina vê terorê tekoşîneke berfireh ya polîtîk, aborî û bîrdozî pêwîst e. Barzanî da zanîn ku herêm, ji bo peydabûna ramanên tûndrew derfetan diafirîne û dom kir: "Li Herêma Kurdistanê û Iraqê, ji bo penaberên ku ji cih û warên xwe reviyane dîsa vegerin cih û warên xwe, pêwîst e DAIŞ bi tevahî ji holê bê rakirin û ji bo vê yekê jî divê herkes bi awayekî alîkariya şerê li dij DAIŞ'ê bike. Di hevdîtinê de Nancy Lindborg jî da zanîn ku helwesta RHK'ê ya di derbarê penaberên ku koçî Kurdistanê kirine nimûneya mirovperweriyê ye ku divê hemû mirovahî pê serbilind be û ji ber vê helwestê spasyên xwe pêşkêşî Barzanî û gelê Kurdistanê kir. Piştî axaftinan şandeyê di derbarê xebatên xwe de Barzanî agahdar kirin.

### Hiqûqnasê Destûrê Prof. Kaval: Parlamenan Mussolini û Hitler hilbijart

Pisporê Pêwendiyên Navneteweyî û Hiqûqa Destûrî Prof. Mûsa Kaval, di derbarê qeyrana serokatiyê de bi ser BasNûçeyê nirxandinan kir. Kaval nêrînên ku gel serokan hilbijêre dîktayê tîne û parlamen hilbijêre demokrasî digeşe wek nêrînên manîpulatîv nirxand, ji dinyayê nimûneyan da û got: "Dîktatorên herî xerabkar Mussolini û Hitler ji alî parlamenan ve hatin hilbijartin. Frensa ji 1962'yan şûnve Serokkomarê xwe ji alî gel ve dide hilbijartin û ji wê salê heta niha Frensa qeyraneke siyasî nejiya ye. Îtalya heta 2012'an ji 6 mehan carekê bi qeyraneke siyasî re rû bi rû dima; Lê piştî pergala hilbijartina Serokkomariyê guhert û erka hilbijartina wî radestî gel kir yek qeyranekê jî nejiya. Li piraniya welatên Ewropa û gellekên Amerîka Latîn ku feyza xwe ji Ewropa werdigirin serok an serokkomar ji alî gel ve têne hilbijartin û li van welatan tu meyldariyeke dîktatoryal pêk nehatiye. Bêguman welatên ku gel serok hilbijartiye û veguhestine dîktaroriyê jî hene, lê belê sedemê vê yekê ne pergala hilbijartinê, goncaviya binesaziya civak û siyaseta wan welatan e" Kaval di derbarê qeyrana li Başûr de jî ramanên xwe parve kir û anî ziman ku ji bo RHK'ê pergala herî baş ji alî gel ve hilbijartina serok e. Kaval got: "Li Başûr tu partiyek ku dikaribe bi serê xwe bibe hikûmet tune ye û ji ber ku parlamen destûr dide dest bi karkirina hikûmetê, piştî her hilbijartinan egeriya qeyrana dirustkirina hikûmetê peyda dibe. Ger ku serok jî ji alî parlamenê ve bê hilbijartin wê ji dû salan carekê qeyran peyda bibe û ev rê li berê vedike ku hêzên derveyî bêtir destwerdana navxweyî ya RHK'ê bikin" Di derbarê çarenûsê de jî Kaval pêwîstî bi wê yekê kir ku divê hemû partiyên siyasî di vê babetê de paşve gav bihavêjin. Kaval got: "Ger paşve gav nehavejin, ev qeyran li gel Başûr wê ziyanê bide perçeyên din jî"

### Papa: Divê serokatiya Barzani berdewam be

Piştî DYA, Îngilîstan û Neteweyên Yekbûyî(NY), Vatîkanê jî daxwaza berdewamiya serokatiya Mesûd Barzanî kir. Vatîkanê bi ser Nûnerê Taybet ê Rojhilata Navîn ê Papa Francis'ê Serokê Rûhanî yê cîhana Katolîk Kardînal Luis Sako ve bi ser navê Papa, nameyek ji Serokê RHK'ê û Serokê Parlamena Kurdistanê re şand. Di nameyê de tê gotin ku ji bo ev pêvajoya xeternak a şer ku li Herêma Kurdistanê bûye sedemê qeyranên siyasî, aborî û ewlehiyê bi serkeftî bê derbaskirin divê Birêz Mesûd Barzanî 2 salên din jî postê serokatiya RHK'ê hilgire.

### Çalakiya kêmkirina mûçeyê rayedaran encam da

Li Hewlêrê piştî xwepêşandana ku bi mebesta nîşandana berteka li hemberî mûçeyên zêde ên rayedarên hikûmetê û rêvebirên payebilind ku hatibû lidarxistin, Alîkarê Serokê Parlamena RHK'ê Cafer Emînkî ragihand ku di demeke nêz de ji bo jiholêrakirina bêdadiya dahatî mehaneyên rêveberên payebilind wê ji nû ve bê rêkûpêkkirin. Sêşema çûyî, bi pêşengiya rêxistinên kedê li ber Parlamena Kurdistanê ji ber ku li Herêma Kurdistana ku di nav tengasiya aborî de ye û kedkar bi mehan mehaniyên xwe nastînin û li hember vê rayedarên payebilind mehaniyên pir zêde distînin û ev yek di civakê de dibe sedema acizbûnê çalakî li dar xistibûn daxwaza hevdîtinê ji rayedarên parlamenê kiribûn. Nûnerên rêxistinên kedê ku piştî çalakiyê daxwazên hevditîna wan hatibû pejirandin, di hevdîtina digel Endamên Lijneya Serokatiya Parlamenê de daxwaz kiribûn ku bi bila mehaniyên rêveberên payebilind ji % 50 were daxistin û belavkirina dabeşiya dahatê bila dadwertir bê dabeşkirin. Piştî hevdîtinê Lijneya Serokatiya Parlamenê û nûnerên rêxistinên kedê daxuyaniyeke hevpar dan û gotin ku li ser vê mijarê di bin sîwana parlamentoyê de Lijneyeke fermî ya aboriyê wê were lidarxistin û ji bo rêkûpêkkirina dabeşiya dahatê dê raporan amade bikin. ,

### Kerkûkî: Wê DAIŞ dersa ku Pêşmerge li rojavayê Kerkûkê dabûyê ji bîr neke

Angaşta ku Serokê Kevin ê Parlamentoya Kurdistanê û Fermandarê Pêşmerge ê Rojavayê Kerkûkê Kemal Kerkûkî ji BasNûçeyê re kiribû û gotibû ku DAIŞ'iyan li hemberî Pêşmerge çekên kîmyewî bi kar anîne û ev yek ji hêla rayedarên Emerîkî ve jî hatiye tespîtkirin hat rastkirin. Rayedarekî Emerîkî derbareyê mijarê de ji BBC'yê re rave kir û got ku DAIŞ'ê ne tenê li dijî Pêşmergeyan, li hemberî dijberên xwe yên li Sûrî jî çekên kîmyewî bi kar anîne û 4 bûyerên ku vê yekê dipeyitînin hatine diyarkirin. Derbareyê vê mijarê de ji îstîxbaratên Elman jî peyitandinek hat. Di rojnameya Bild a Elman de di nûçeyeke xwe ya ji îstîxbarata Elmanî hatiye girtin de diyar kir ku bikaranîna çekên kîmyewî a ji aliyê DAIŞ'ê ve ji hêla yekeyên îstîxbaratê ve hatiye peyitandin. Dr. Kerkûkî bale kişand ku digel ku techîzatên Pêşmerge ji bo parastina li hemberî çekên kîmyewî têr nîne jî têkoşîna Pêşmergeyan hêjayî aferînê ye û got ku DAIŞ'ê li Rojavayê Kerkûkê hewl da ku êrîşî Pêşmergeyan bike lê bi êrîşên Tabûrên Pêşmerge û Yekîneyên Topavêj û Pêşmergeyên Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) digel balafirên Hevpeymanê DAIŞê hatiye têkbirin û gelek DAIŞ'î jî hatine kuştin û DAIŞ, dersa ku Pêşmerge li Rojavayê Kerkûkê jê re dabû dê ji bîr neke. Di vê navberê de hat xuyakirin ku 60 malbatên ereban ên ji 400 kesan pêkhatî ku ji gundên Dakûk, Xurmatû û nexasim ji gundê Smaga Xwarê reviyane xwe spartine qadên Pêşmergeyan. Berpirsiyarê Hêzên Asayîşê ên Navçeya Dakûkê Pola Delo got ku piştî ku li ser hebûn an tunebûna têkiliya wan bi DAIŞê re lêkolîn bê kirin ew ê wan li cihên guncaw bên bicihkirin. Li gor agahiyên ji çavkaniyên Pêşmerge yên Eniya Mûsilê bidestxistî, berî ku DAIŞ'iyê ku li hemberî Pêşmergeyan êrîşa xwekujiyê pêk bîne digel bombeya li ser xwe hatiye kuştin. Her wiha hat ragihandin ku DAIŞ'ê 3 dîlên ku ji ber ku alîkariya Pêşmergeyan kirine hatine girtin bi navên Abdula Mihemed Hesen, Kazim Kerîm Ahmed û Nûredîn Îbrahîm ên li Girtîgeha Beacê înfaz kirin. Berpirsiyarê Buroya Mûsilê ya PDK'ê Saîd Memuzînî got DAIŞ'ê li malên wan geriyane û tê de cil û bergên Pêşmergeyan dîtine û ew wek palpiştiya alîkariya Pêşmergeyan dîtine, ji ber vê ev 3 kurdên ji Mûsilê kuştine.

### 'Barzanî operasyona Wankeyê saz kir û meşand'

Serokerkanê RHK'ê Cemal Muhemmed got ku operasyonên ku Pêşmergeyan heftiyên çûyî bi armanca paqijkirina derûdora nehyeya Wankeyê ji DAIŞ'ê dan destpêkirin ji aliyê Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî ve hatine sazkirin û meşandin. Mihemmed, derbareyê fikrên Barzanî de ji BasNûçeyê re ragihand ku beriya operasyonên Wankeyê Barzanî, bi navê Serfermandarê hin operasyon saz kirine û ne tenê saz kiriye her wiha beşdarî operasyonê bûye û operasyon bi awayekî serkeftî bi dawî bûne û wisa domand: "Hemû herêmên ku armanc, di çerçoveya pêşnûmeya operasyonê de armanc bûn hatin bidestxistin û 15 êrîşên bi amûrên ên DAIŞ'ê vala hatine derxistin û bi vê operasyonê Rojavayê Dîcleyê û Bakurê Mûsilê ketine bin kontrola Pêşmergeyan"



## Serokê PSDK'ê Mihemed Hecî birîndar bû


Di kêliya ku operasyona ku Hêzên Pêşmerge bi mebesta rizgarkirina gundên li herêma Dakûka li başûrê Kerkûkê dabû destpêkirin bi awayekî serkeftî domand de Sekreterê Giştî yê Partî Sosyalîzma Demokrat a Kurdistan(PSDK) Mihemed Hecî birîndar bû. derbareyê mijarê de Fermandarê Eniya Rojavayê Kerkûkê Kemal Kerkûkî ji Basnûçeyê re agahî dan û got ku di dema operasyonên ku roja înê bi armanca rizgarkirina gundên li herêma Dakuka li rojavayê Kerkûkê hatibûn destpêkirin de dema ku operasyon bi rê ve dibirin di endama teqîna tepika ku amûr pêl wê kir de Serokê PSDK'ê Mihemed Hecî Mehmûd û 23 Pêşmerge birîndar bûn û 3 Pêşmerge jî jiyana xwe ji dest dan. Kerkûkî da zanîn ku poerasyon bi aayekî serkeftî didome û rewşa Serokê PSDK'ê baş e û xeteriya wî ya jiyanî tune. Endamê Lijneya Rêveberiyê yê PSDK'ê Rifat Mihemed jî ji BasNûçeyê re ragihand û got ku teqîna tepikê li nêzîkî gundê Ebul Mihemed pêk hatiye û Mihemed Hecî Mehmûd bi awayekî sivik birîndar bû.

## "Hêmanê serkeftina me yekîtiya neteweyî ye"

Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî bi mebesta 54. Salvegera Şoreşa Îlonê ya ku di 11'ê Îlona 1961'an de bi serpereştiya Mele Mistefa Barzanî pêk hatibû peyamek şand. Di vê peyama ku di derbarê hemû qeyranên ku li çar aliyê Kurdistanê têne jiyîn de bangeqazî hene de Barzanî, da zanîn ku hemû astengiyên li pêş gelê kurd dikare bi yekîtiya neteweyî bêne çareserkirin u got: "Hêmanê serkeftina me yekîtiya neteweyî ye" Barzani, anî ziman ku Şoreşa Îlonê di dil û hişmendiya hemû neferên gelê kurd de şitilê vê baweriyê şên kirî ye ku kurd neteweyek cuda ye, wek her gelên azad ger ku kurd jî li dij zordestiya metîngeran tekoşîna rizgariya neteweyî bimeşîne wê dikaribe azadî û serxwebûna xwe bi dest bixin. Barzanî destnîşan kir ku ev şoreşa ku piştgiriya hemû çîn û pêkhateyên Kurdistanê wergirtiye, bi vî awayî veguhêziye tevgereke hevbeş a demokrasî û azadiyê. Barzanî got: "Hêmanê serkeftina me yekîtiya neteweyî ye"

## "Deriyê me ji hemû pêşniyazan re vekirî ye"

Li gel bandora neyênî ya qeyrana siyasî ku nêzîkî mehekê ye serê RHK'ê diêşîne jî ji bo heyênîtiya vê bandorê bê şkandin xebat didomin. Rawêjkarê Asayîşa Giştî yê RHK'ê û Endamê Polîtburoya PDK'ê Mesrûr Barzanî ku bi berpirs û xebatkarên Buroya Birêxistinê ya PDK'ê ya Hewlêrê re civînek pêk anî, piştî civînê semînerek da. Barzanî ku di derbarê babetên sereke yên rojeva Kurdistanê de ramanên xwe parve kir diyar kir ku ji bo çarenûsa qeyrana siyasî deriyê wan ji her pêşniyazê re vekirî ye û dom kir: "Lê belê emê rê nedin ku partî parlamenê wek alava dîktayê bikar bînin. Hêviya me ew e ku em vê qeyranê bi rêbaza diyalogê tafîlê çareser bikin" Di derbarê parastina pêkhateyên neteweyî û olî de jî Barzanî da zanîn ku parastina wan jî di çarçoveya parastina Kurdistanê de erka wan a sereke ye. Barzanî got: "Bi mebesta hurmetdariyê, ji ber ku peyva 'kêmnetewe' kêmasiyê tîne ziman em vê peyvê jî bikar nayînin"





www.arsivakurdi.org



# Rojava: Siyaset bi hev dikeve, gel bi rêyan dikeve!

**Mehmet Salih Batırhan**

Koçberiya xelkê Rojava ber bi Ewrûpa ve berdewam e û her du bereyên siyasî yên kurd li Rojava ENKS û TEV-DEM hev tohmetbar dikin û aliyê din weke berpirsyar dibînin. TEV-DEM û ENKS weke her tim daxuyaniyên li dijî hev didin, lê heya niha tiştek ji bo rawestandina pêla koçberiyê nekirine û tirsa xelkê heye ku heta ku ENKS û TEV-DEM lihev bikin, Rojavayê Kurdistanê vala bibe. Pêla koçberiyê ji Rojava roj bi roj bihêztir dibe û herdu bereyên kurd hevdu di ber vê koçberiyê de tohmetbar dikin. Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) dibêje ku Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) û desthilata wê bi siyaseta xwe berpirsê vê koçberiyê ye. Partiyên rêveberiya xweser dibêjin ku ENKS xelkê ji bo koçberiyê teşwîq dike. Piştî derketina hejmareke pir ji xelkê Rojavayê Kurdistanê ji bo derve û guhertina demografya herêm û bajarên kurdî, herdû aliyên siyasî yên sereke li Rojavayê Kurdistanê hevdû bi berpirsyariya vê pêla koçberiyê tohmetbar dikin.

Li gorî hin tehlîlgeran di encama pêla koçberiyê de, nêzîkî neviyê gelheya kurdên Rojava li derveyî sînorên welatê xwe ne û hin bajarên kurdî ku rêjeya kurdan tê de sed der sed bû niha daketiyê sed der pêncî û ew amar jî roj bi roj kêmtir dibin. Ji roja derketina krîza Sûriye'yê heta niha bi serperşitiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî partiyên siyasî yên Rojava hewldan ku di rêveberiya Rojava de hemaheng bin û bi hevre birêvebibin. Hem di Peymana Hewlerê û Hem jî di Peymana Duhokê jî de sê xalê sereke hebûn û ew jî ew bûn ku ew ê di warê aborî, leşkeri û siyasî de lihevkirinek di navbera partiyên siyasî avabûbûya û ew ê ji bo xelkê Rojava siyaset bihata meşandin.

Piştî her rêkeftinê PYD ji ser maseya Lêvegera Siyasî ya TEV-DEM û ENKS!ê rabû û siyaseta xwe li ser Rojava ferz kir. Di kurtedemekê de kanton ava kir û dirûşmeyên azadiyê berz kir. PYD'ya ji diyalog û demokrasiya kurdan aciz di nava çend mehan de hemahengi bi gelek komêm tûndrew ê îslamî re danî û kir ku ew hemû kom û grûbên tûndrew li Rojava hespê bibezînîn. Digel vê yekê nedîtîna polîtîkayekê ji ba xelkê Rojava, ferzkirina leşkeriya neçarî û nediyariya paşerojê dibe sedem ku xelkê Rojava berê xwe bidin welatên din û ji Rojava derkevin. Her çend dezgeha bi ser PYD'ê ya bi navê Navenda Lêkolînên Stratejîk a Rojava div an rojên dawî de amaran belav bike û ragihîne ku xelkê Rojava ne terefgîrê koçbeririyê nin malên firotinê yên Qamişlo û Amûdê, nediyarbûna aqûbeta 400 hezar kurdên Kobanê dide zanîn ku pêleke mezin a koçberiyê li Rojava heye û çavê desthilatdariya Rojava vê yekê nabîbe û guhê wan jî nabihîze. Di vê çerçoveyê de hemû partiyên siyasî yên her çar parçeyên Kurdistanê li ser valabûna Rojava rawestiyan û ji Basnûçeyê re axivîn. Partiyên siyasî wê yekê tekez dikin ku divê PYD dev ji siyaseta xelet berde û li ser berjewendiyên siyasî bi ENKS'ê re li hev bike.

## "Wê demografiya Kurdistanê biguhere"

Endamê Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê Sadî Pîra (YNK) jî da zanîn ku Rojava di nava 4 salan de tûşî gelek şer û pevçûnan bûye û xelkê Rojava bi fikra emnî tevdigerin û dixwazin êdî paşerejoke wan a baş hebe û xwe ji şer û pevçûnan dûr bixin. Di berdewamiya axaftina xwe jî de Sadî Pîra amaje bi wê yekê jî kir ku partiyên siyasî yên Rojava dijberiya hev dikin û ji bo çareseriyê tevnagerin û ew bi erka xwe ve ranabin. Her wiha Pîra amaje bi wê yekê jî kir ku divê partiyên siyasî yên Rojava li gel hev bin û di birevebirina Rojava de hemaheng bin. Pîra dijberiya di navbera ENKS'ê û TEVDEM'ê jî bi bîr xist û wiha berdewam kir: " Nûnerên ENKS'ê li Hewlerê rûniştînin. PYD' jî şaşîtiyan dike lê belê îro parastina Rojava dike. PYD ji Rojava dernakeve. Ev ji bo me serbilidiye lê divê partiyên Rojava li hev bikin." Di berdewamiya axaftina Sadî Pîra amaje bi wê yekê jî kir ku valanûna Rojava dê di demografiya Kurdistanê de guhertinan pêk bîne.

## "PYD'ê peyman bi cih neanîn"

Serokê Azadiya Kurdistanê (PAK) Mustafa Özçelik jî bal kişand ser rewşa Rojava û amaje bi wê ykeê kir ku îlankirina kantonanan û rêveberiya ku niha li Rojava heye reya wê yekê vekiriye ku li Rojava bi tenê partiyeke siyasî hebe. Her wiha Mustafa Özçelik, ragihand ku siyaseta PYD'ê rê li ber vê yekê jî girtiye ku partiyên din ê kurd li Rojava bibin xwedî otorîte hêz û li Rojava bi cih bibin. Di berdewamiya axaftina xwe jî de Mustafa Özçelik bal kişand ser Peymanên Hewlêr û Duhokê yên di navbera ENKS'ê û TEVDEM'ê jî de û wiha berdewam kir: " Li gor Peymanên Hewlêr û Duhokê diviyabû li Rojava di warê leşkeri, siyasî û aborî de ENKS' ê û TEVDEM'ê de lihevkirinek û rêveberiyeke hevbeş bihata avakirin lê belê PYD'ê ev yek qebûl nekir." Her wiha Mustafa Özçelik amaje bi wê yekê jî kir ku vegera xelkê Rojava bi lihevkirineke siyasî û rêveberiyeke siyasî mûmkûne û divê demildest ev yek bê kirin.

Di berdewamiya axaftina xwe de Mustafa Özçelik daxuyand ku di salên 1960'î rejima Baas li Rojavayê Kurdistanê kemerek erebî saz kiribû wê kemere gelekî zirar dabû kurdan. Mustafa Özçelik her wiha eşkere jî kir ku zirara şerê niha yê li Rojava ji yê kemera erebî zêdetir bûye û kurd ji cihê xwe dibin û ereb di şûna wan de bi cih dibin û ev yek jî ji bo demografiya Kurdistanê dibe xetererek mezin û egera wê jî heye kurd li Rojava neminin. Her wiha Mustafa Özçelik ragihand ku divê siyaseteke neteweyî hebe.

## "Divê çare bê dîtin"

Berpirsê Karên Dîplomasiyê yê Hereketa Goran, Mihemed Tofiq jî amaje bi wê yekê ki ku divê partiyên siyasî yên Rojava yekîtiyekê saz bikin û li gora wê siyasetê tev bigerin. Her wiha Tofiq ragihand ku divê hemû partî ji bo rêveberiya Rojava li hev bikin û nabe ku yek partî xwe li ser xelkê zal bike. Li hêla din Tofiq amaje bi




wê yekê jî kir ku rewşa Başûrê Kurdistanê jî ne baş e û eger rewşa RHK'ê hebûya dê bêhtir alikariya Rojava bikira û rêgiriyek li ber koçberbûna xelkê Rojava bidîta. Di berdewamiya axaftina xwe de Tofiq keçberiya xelkê Rojava weke xetereyeke demografik dest nişan kir û bal kişand ser wê yekê ku divê demil dest çareyek ji vê koçberiyê re bê dîtin.

## "Atmosfera demokrasiyê tuneye"

Endamê Desteya Rêveber a PDK Elî Ewnî jî bal kişand ser pêkutiyên PYD'ê yên li ser partiyên din ê Rojava û eşkere kir ku PYD'ê kiriye ku alternatifên din ava nebe û fezaya demokrasiyê li Rojava bi hêz bibe. Ewnî di berdewamiya axaftina xwe jî de amaje bi wê yekê jî kir ku eger di navbera layanê siyasî yên kurd de çareserî bê çêkirin egera wê heye koçberiya xelkê kêm bibe û xelk şik û gumanan nexwe û welatên xwe neterikikîne. Ewnî ragihand ku siyaseta tekwanî her tim kesên ne ji xwe ji wê dere derdixe û ew yek jî dibe sedema binpêkirina mafê mirovan. Ewnî daxuyand ku ji ber nebûna deramedeke baş jî xelk ji Rojava derdikevin û divê sîstema heyî çareseriyekê ji vê yekê re peyda bike û baweriyê bidin xelkê ku ew ê ew kêşa çareser bibin. Ewnî jî da zanîn ku divê demil dest çareyek ji koçberiya xelkê re bê dîtin û rê li ber koçberiyê bê girtin.

## "Koçberî xetereye ji bo berjewendiyên neteweyî"

Endamê Polîtbûroya PDKÎ'yê Rûstem Cihangîrî jî eşkere kir ku şer û pevçûnên dijwar Rojava wêran kir û bû sedema koçberiya xelkê Rojava. Her wiha Rûstem Cihangîrî amaje bi wê yekê jî kir ku aboriya xelkê Rojava jî nebaş e û xelk nikare pêdawîstiyên xwe yên bingehîn dabîn bike û ji ber vê yekê jî ji xwe re li çareyekê digere û çareye di koçberiyê de dibîne. Rûstem Cihangîrî daxuyand ku koçberiya kurdên Rojava metirsiyê bi hemû kurdan re çêdike û ew hemû dilgiran da ku çareyek ji Rojava re bê dîtin û xelk li cih û warê xwe vegere. Di berdewamiya axaftina xwe de Rûstem Cihangîrî amaje bi wê yekê jî kir ku divê partiyên siyasî li hev bikin û çareyekê ji wê rewşê re peyda bikin û hevdû bi tiştên biçûk tewanbar nekin. Rûstem Cihangîrî eşkere jî ki ku koçberiya xelkê Rojava xeteriyê ji bo berjewendiyên neteweyî û wiha berdewam kir: "Di rêyên koçberiyê de gelek tişt tên sere wan. Çete û mafya û gelek bobelatên din hewceye çare ji vê yekê re bê peydakirin."



Li gorî hin tehlîlgeran di encama pêla koçberiyê de, nêzîkî neviyê gelheya kurdên Rojava li derveyî sînorên welatê xwe ne û hin bajarên kurdî ku rêjeya kurdan tê de sed der sed bû niha daketiyê sed der pêncî û ew amar jî roj bi roj kêmtir dibin.

## "Koça herî zêde ji Kobanê bûye"

Parlementerê HDP'ê yê Rihayê Îbrahim Ayhan jî li ser rewşa koçberbûna xelkê Rojava rawestiya û da zanîn ku li gor çavdêrî û lêkolînên wan herî zêde ji Kobanê xelk koçberbûye û ji ber nebûna mal û xaniyan cih tüne ku xelk di wan malan de bi cih bibe. Ayhan rahihand ku niha li Kobanê avakirina Kobanê berdewam dike û divê hemû kes dest bi alikariyê bike û da ku Kobanê ji nüve ava bibe. Her wiha Îbrahim Ayhan bang li partiyên siyasî yên kurd jî kir ku alîkariya Kobanê bikin û Kobanê ava bikin û pêdawîstiyên xelkê Rojava dabîn bikin û nehêlin tu kes ji Rojava dernekeve. Îbrahim Ayhan wiha berdewam kir: "Car caran em diherin serdana Kobanê dikin. Li hêlekê rêveberiya kantonê li hember DAIŞ'ê şer dike û li hêla din Kobanê ava dikin. Herî zêde ji Kobanê sivîl koçber bûn. Çi partiyên Başûr ji yên Bakur û çi ji Ewrûpa hemû kes dikare alîkariya Rojava bike."

## "Sedema koçberiyê otorîteya siyasî ye"

Serokê PDK Bakur Sertaç Bucak jî li ser meseleya valabûna Rojava rawestiya û daxuyand ku berê şerê Rojava hebû û xelk ji ber şerê dijwar ê DAIŞ'ê direviya lê belê şer bi dawî bûye û PYD'ê dibêje Rojava azad e û wan kantona jî avakirine. Bucak her wiha eşkere kir ku xelk ji ber rewşa xirab a aboriyê û ewlehiyê direve û sedema vê yekê jî otorîteya siyasî û çekdarî ya Rojava ye. Bucak her wiha amaje bi wê yekê jî kir ku PYD naxwaze otoriteya Rojava li sazî dezgeh û partiyên din ê kurdan parve bike. Bucak bal kişand ser çanda demokrasiyê û danustendinên di navbera kurd û welatên din de û eşkere kir ku heta li welatekî partiyek bi tena sere xwe desthilatdar be û bi pirr dengî li wî welatî tunebe tu kes alîkariyê nadin wî welatî û divê kurd jî li gora vê yekê tevbigerin û di rêveberiyê de li hev bikin. Bucak siyaseta PYD'ê jî rexne kir û da zanîn ku welat û ax ji bo mirov in û eger mirov lê tunebin tu giringiya wî welatî tuneye û divê xelkê Rojava sebir bikin û ji welatê xwe dernekevin. Bucak bang li PYD'ê jî kir û wiha berdewam kir: "Banga min li PYD'ê û YPG'ê divê siyaseteke neteweyî li Rojava bê meşandin. Hewceye Pêşmergeyên Rojava jî werin Rojava û ew jî bi erka xwe ve rabin û li gel şervanên YPG'ê li hember DAIŞ'ê şer bikin.

## "Xelk ji ber bêtiffaqiyê dibe koçber"


Cihgirê Partiya Demokarata Kurdistana Tirkiyê (PDK-T) Cemşîd Firat jî li ser koçberiya xelkê Rojava axivî yekem sedema koêçberbûna xelkê Rojava nebûna yekîtiyeke siyasî dest nişan kir. Cemşîd her wiha eşkere kir ku beriya hemû tiştî divê partiyên siyasî yên kurd li hev bikin û ji bo xelkê Rojava siyasteke navendî peyda bikin. Her wiha Cemşîd Firat amaje bi wê yekê jî kir kur çareserî ew e ku hemahengi di navbera partiyên siyasî de çê bibe û mafê kurdan bê parastin. Di berdewamiya axaftina xwe jî de Cemşîd Firat diyar kir ku heta niha wan gelek caran bang li partiyên Rojava kiriye da ku çareseriyê bibinin û ew jî amadene ji çareseriya krîza koçberên Rojava.

## Siyaseta PYD'ê ne diyar e

Endamê Polîbûroya Partiya Demokrata Kurdistana Sûriye (PDKS Mihemed Îsmaîl jî bal kişand ser rûdanên dawî yên li Rojava û koçberiya xelkê Rojava li ser çalakiyên ENKS'ê rawestiya. Her wiha Îsmail rewşa xeternak a guherîna demografiya Rojava jî şîrovekir û eşkere kir ku zêdeyî çar sala ye li Rojava şer heye û xelk ji ber şer gelekî aciz e. Di berdewamiya axaftina xwe jî de Îsmail daxuyand ku xurek û av jî li Rojava nemaye û metirsî li ser jiyana xelkê çêbûye û xelk ji bo xwe rizgar bike ji Rojava derdikeve. Îsmail amaje bi wê yekê jî kir ku Rojava hatiye dorpêçkirin û rê tuneye ku xelk ji xwe re nan û avê peyda bikin. Îsmail da zanîn ku DAIŞ'ê ji hêla başûr dorûbera Rojava xistiye destê xwe û peywendiya Rojava bi deverên din re nemaye û Rojava di bin ambargo deye. Li hêla din Îsmail da zanîn ku siyaseta ne diyar a PYD'ê jî xelk aciz kiriye û ew siyaset bûye sedem ku xelk cih û warê xwe bihele û koçber bibe.

## "Koçberî tê teşwîqkirin"

Hevserokê Kantona Cizîrê Şêx Himêdî Deham El-Hadî jî diyar kir ku koçberiya ji Rojava reva ji berpirsyariyên xwe yên parastina welate û destnîşan kir ku hin derdorên dijberiya siyaseta xweseriya demokratîk dikin û koçberiyê teşwîq dikin da ku herêmê ji şêniyên wê vala bikin. Di berdewamiya axaftina xwe de Şêx Himêdî Deham El-Hadî derbarê koçberiyê jî de axivî di destpêkê de bang li hemû gelê herêmê kir ku yekîtî û hevkariya xwe xurt bikin û di pêşketina herêmên xwe de misyonê bigirin. Hadî, bal kişand ser êrîşên li dijî Rojava û ev tişt wiha axivî. "Hêzên dijberiya gelê herêmê dikin, ji bo valakirina herêmê plan danîne. Dixwazin çanda herêmê tune bikin û herêmê ji şêniyên wê vala bikin."Şêx Deham El-Hadî diyar kir ku tu sedemên koçberiyê ji Rojava nîne û bang li hemû welatiyên herêmê kir ku cihê xwe di avakirina herêmê de bigirin û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Pêwîstiya me bi şêniyên herêmê hene, tu sedema koçberiya ji Rojava nîne, em hêvî dikin ku hemû kes cihê xwe di pêşketin û avakirina Rojava de bigrin, projeyan vekirin û çanda zanistina di navbera hemû pêkhateyan belav bikin.


Deham El-Hadi


Sertaç Bucak


İbrahim Ayhan


Mustafa Özçelik

BasNûçe 14 - 20 Îlon 2015


**Endama Meclîsa Bilind a Jinan Emel Celal:**

# Divê di jiyanê de jî weke li sengeran vekhevî hebe

**Siwar Bedirxan**

Piştî Şoreşa Gulanê ya Başûrê Kurdistanê dezgehên Rejima Baas ji nav çûn û kurdên Başûrê Kurdistanê dest bi avakirina dezgeh û komeleyên xwe kirin û xwe ji rêveberiyê re amade kirin. Her wiha di vê çarçoveyê de Rêveberiya Herêma Kurdistanê li Hewlêrê parlemento danî û weke welatekî federal ji aliyê hemû dewletan hat naskirin. Li hêla din RHK'ê ji bo parastina kemîneyên olî û çandî gelek yasa û qanûn amade kirin û nûnerên cemiyetên olî û netewî li Kurdistanê di parlementoyê de bûn xwedî kursî. Li gel vê pêngava demokrasiyê, çanda pêkvejiyanê û toleransê jî gelekî xurt bûye û RHK li Rojhilata Navîn weke nimûne tê destnîşankirin.

Li hêla din niha li RHK'ê amadekarî û nivîsîna destûreke bingehîn jî didomin. Jinên RHK'ê di nava wê hewldanê denin ku nûnertiya jinan a siyasî xurt bikin û mafê jin û mindalan di destûra nû de bên bi cihkirin û mafê jinan bê parastin. Endama Meclîsa Bilind a Jinan Emel Celal di derbarê xebatên jinan ên li Başûrê Kurdistanê, nûnertiya jinan a di partiyên siyasî û parlementoyê de ji BasNûçeyê re axivî. Emel Celal da zanîn ku jinên kurd di her qonaxê de weke hevrêyan li gel mêrê kurd bi erka xwe ve rabûne û ewê ji niha û bi şûn de jî li ser erka xwe berdewam bin. Her wiha Emel Celal da zanîn ku niha RHK'ê di proseya serbixwebûnê de ye û xewna jinên kurd jî ew e ku Kurdistana serbixwe bibinin.



**Li Başûrê Kurdistanê mafê jinan di destûra bingehîn de hatiye parastin? Di destûra bingehîn de ji bo parastina mafê jinan tu yasa hene gelo?**

Dema em, berawirdiyê bikin li gor salên berê bê gûman niha di warê parastina mafê jinan de pêşketinek li Başûrê Kurdistanê heye. Bi taybetî piştî Şoreşa Gulanê gelek guhertin pêk hatin. Jinên kurdan di nava tevgerên rizgariya Kurdistanê de cihê xwe girtin. Erka xwe ya komelgehî bi cih anîn. Eger em bên ser pirsa te di qanûnan de guhertin pêk hatin û hin guherîn hatin kirin. Lê bele ev yek kêm e. Di warê beşdariya jinan a siyasî de divê hin guhertinên nû jî pêk werin. Weke nûmûne niha beşdariya jinan a di Parlementoya Kurdistanê de ji sedî sîh e. Ev diyarde ji bo jinên kurdan kêm e. Hewceye ew zêde bibe. Çiqas beşdariya jinan zêde bibe di warê demokrasiyê de jî pêşketin rû dide.

Eger em werin ser rewşa komeleyî em dibinin tûndûtijî ya li ser jinan berdewam dike. Jin rastî lêdan û îşkenceyê tên. Pir mixabin partiyên siyasî jî dev ji bîr û bawriyên kevn û kon bernedane û hîn li ser wê fikre kon in. Pirjinî hîn jî berdewam dike. Hîn jî bi sê, çar jinan re îzdîwaç berdewam dike. Ev yek mixabin binpêkirina mafê jinan bi xwe re tînê. Divê bi yasa û qanûnan rê li ber vê yekê bê girtin û dezgehên qanûn û yasayî vê yekê ji holê rakin. Jinên Başûrê Kurdistanê niha xwedî gelek dezgeh û rêxistinin. Ew rêxistin divê di pêngavên demokrasiyê de cihê xwe bigrin. Mafê wan dezgeh û komeleyên medenî divê bêne parastin. Ji bo beşdariya wan a li demokrasiyê divê qanûn ji nûvê bên guhertin. Yasayên heyî kêm in. Mafê jinan di wan qanûnan de bi awayekî modern nehatiye parastin û yekser ne li ser mafê jina ne.

Ez dixwazim dîsa werim ser meseleya pirjiniyê. Weke Meclîsa Bilind a Jinan me hewl da ku ev mesele ji holê rabe. Lê bele endamên parlamentoyê ji vê yekê re amade nebûn. Ew ji vê hewldanê razî nebûn. Hin guhertin hatin kirin. Lê bele ew dîsa jî berdewam dike. Her çend di nava van çend salên dawî de li Başûrê Kurdistanê pirjinî kêm bûbe jî kesên vê yekê dikin diçin li navçeyên Iraqê vê yekê pêk tînîn. Li gor yasayên Iraqî tu dikarî vî karî bikî. Piştî hewldana hin saziyên sivîl ên jinan û guhertina hin qanûnan kesên li vê yekê digerin diçin navçeyên Iraqê vî karî dikin. Piştî wê zewaca wan a li navçeyên Iraqî qazî û hakimên Kurdistanê jî wê îzdiwacê pesend dikin. Weke Meclîsa Bilind a Jinan me daxwaz ji Parlementoya Kurdistanê jî kir ku rê li ber vê yekê bigre û nehêlê ev kar bê kirin.

Tûndiya li ser jinan bi taybetî bi tene li jinan nayê kirin. Li zarok û mindalan jî tê kirin. Di warê rewanşinasî de derûniya wan xirab dibe. Malbat têk diçe. Divê em ji tûndiyê jî bi tenê tûndiya cesteyî fêm nekin. Lewre bi her awayî jin rastî tûndiyê ten. Hem tûndiya cesteyî heye. Hem tûndiya nefsî heye. Li hêla din tûndiya rewanşinasî heye. Mêr bi awayekî bi hincetan tûndiyê li jinan dikin. Me gelek qanûn û strateji dursitkirin û me dan Serokatiya Parlemena Kurdistanê. Li hêla din lijneyeka çavdêriya mafê jinan dike hat avakirin. Ew lijne jî bi ser Wezareta Navxweyî hat avakirin. Yanî em dikarin bejin ku jin ne ew bûnewere ku bê parastin ji mirinê. Dema em li ser mafê jinan radiwestin wisa tê fêmkirin ku divê jin ji hêla mêran ve neyên kuştin û jin di malan de bên parastin, na armnca me ne ew e. Em dixwazin feraseta binpêkirina mafê jinan ji holê rabe.




**Pirjinî hîn jî berdewam dike. Hîn jî bi sê, çar jinan re îzdîwaç berdewam dike. Ev yek mixabin binpêkirina mafê jinan bi xwe re tînê. Divê bi yasa û qanûnan rê li ber vê yekê bê girtin û dezgehên qanûn û yasayî vê yekê ji holê rakin. Jinên Başûrê Kurdistanê niha xwedî gelek dezgeh û rêxistinin. Ew rêxistin divê di pêngavên demokrasiyê de cihê xwe bigrin**

**Di nava partiyên siyasî de di parlementoyê de dabeşkirinek çawa heye? Asta hevsengiyê hatiyê bi dest xistin?**

Kêşaya mafê jinan divê bi yasa qanûn û ferasatan biguhere. Bi perwerdehiyê biguhere. Eger ne wisa be çareserî ewê ne mumkun be. Çareserî ew e ku jin di nav komelgehê de xwedî erk bin û ew bi erka xwe ve rabin. Çareserî ew e ku jin beşdarî proseya demokrasiyê û siyasete bibin. Çareserî ew e ku jin nûnertiyê bikin. Jin mafê xwe bi xwe biparêzin. Çi di warê parlementoyê de çi jî di warê komelgehî de divê jin nûnertiyan bikin. Bêhtir bi karûbarê civakê re mijûl bibin û ji bo vê yekê qanûn bêne derxistin. Em li Başûrê Kurdistanê binerin, em dibînin ku nûnerî û beşdariya jinan a li demeokrasî û siyasetê kêm e. Serokê Herêma Kurdistanê, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, Serokê Parlementoya Kurdistanê hemû mêr in. Rawêjkarê wan jî ne jin in ew jî mêr in. Beşdariya jinana kêm e. Weke jin daxwaziya me ne ew e ku em postan werbigrin. Daxwaziya me ew e ku bila di biryarên li ser Kurdistanê de fikra me jî hebe. Em jî dixwazin biryaran li ser Rêveberiya Herêma Kurdistanê bidin. Em dixwazin bira lijneyeke me jî hebe ku ew lîjne beşdarî komcivînên kêşeyên Herêma Kurdistanê bibe. Em dixwazin ew lijne, ji bo çareseriya krîza serokatiya Herêma Kurdistanê bi karê xwe ve rabe. Em dixwazin ew lijne kêşeyên di navbera partiyên siyasî de heyî çareser bike. Heta niha gelek pêşketin jî hatine bidestxistin lê ew jî kêm in divê bêhtir kar li ser vê yekê bê kirin. Pêşketin û avakirina demokrasiyê hinek jî bi ser kulturê ve ye. Heta ku ew kultur ava nebe ewê nigên wê demokrasiyê kêm bin. Mafê jinan beşdariya jinan a li demokrasiyê jî bi vî rengî ye. Çiqas jin beşdarî demokrasiyê bibin siyaset û demokrasî rengintir dibe. Partiyên siyasî jî beriya bikevin parlementoyê divê di nava xwe de wê kulturê ava bikin. Eger ew ava nebe û bi tenê li ser axaftinên parlementoyê bimînin ewê qels û lawaz bin. Di nava hin partiyên siyasî de hin jin derketine pêş her mixabin ew jî sembolik e û ew kultur ava nebûye.

**Ez dixwazim dîsa bêm ser Destûra Bingehîn a Kurdistanê. Amadekarî û nûsîna destûrê berdewam dike. Di nivîsîna lijneya destûrê de jinan çawa rol girtiye? Hûn çi dikin? Ew kêmasiyên ku we anîn ziman ewê bi vê destûrê bên çareserkirin?**

Bele destûreke me ya Herêma Kurdistanê heye. Û ji bo guherîna wê jî prose berdewam dike. Tirsa jinan li ser wê yekê ye ku fişara ola îslamê zêde bibe li ser komelgeha Kurdistanê. Bi taybetî piştî êrîşên DAIŞ'ê yên ser navçeyên me tesîra îslamê gelekî zêde bû. Weke jinên Herêma Kurdistanê daxwaziya me ew e ku destûreke sekûler bê amade kirin û karê dewletê û kare ola îslamê ji hev bêne cudakirin. Daxwaziya me destûreke medenî ye.

Destûra Kurdistanê divê mafê jin, zarok, kemîne û ayînên cuda biparêze. Tu kêşaye kesî bi ola îslamê re tuneye. Em hemû musilman in. Lê belê kesên li ser navê ola îslamê li ser rûyê erdê kar dikin metirsiyan çêdikin ji bo mafê xelkê. Metirsiyê çêdikin ji bo mafê kemîneyan. Divê destûra bingehîn rê li ber vê yekê veneke. Weke nûnûme gelek kom û grub hene. Her yek ji wan li ser babetekê tiştekî dibêje. Îro em li ser mafê jinan kar dikin, siberojê ew komên îslamî dikarin derkevin û bejin ev karê hûn dikin li dijî ola îslamê ye. Divê hemû tişt zelal be. Karê dewletê cuda be, karê siyasî cuda be, karê îslamî jî her wisa be. Weke nûmûne yekem xala Destûra Iraqê dibêje; "Nabe tu tişt li dijî ola îslamê be." Xala duyem jî dibêje: "Nabe tu tişt li dijî proseya demokrasiyê be." ev yek nakokiyê bi xwe re durist dike. Em naxwazin destûra me jî wisa be. Awata me ew e ku destûreke me ya medenî hebe û di wê destûrê de mafê hemû jinan jî bêne parastin.

**Em li Başûrê Kurdistanê binerin, em dibînin ku nûnerî û beşdariya jinan a li demeokrasî û siyasetê kêm e. Serokê Herêma Kurdistanê, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, Serokê Parlementoya Kurdistanê hemû mêr in. Rawêjkarê wan jî ne jin in ew jî mêr in. Beşdariya jinana kêm e. Weke jin daxwaziya me ne ew e ku em postan werbigrin. Daxwaziya me ew e ku bila di biryarên li ser Kurdistanê de fikra me jî hebe. Em jî dixwazin biryaran li ser Rêveberiya Herêma Kurdistanê bidin.**

**Di derbarê sûnetkirina jinan de gelek amar belav dibin. Gelo rastiya wan amaran he ye? Sûnetkirina jinan berdewam dike an na?**

Eger ez pirsa te ji bo Başûrê Kurdistanê bihesibînim, ez jî bi tenê dikarim weke te bêjim ku rast e û gelek amar belav dibin. Tu jî dizanî ew mesele li Iraqê jî heye. Heta niha dezgehekê bi xususî li ser Başûrê Kurdistanê kar nekiriye. Amarên belav dibin hem yên Iraqê û hem jî yên Başûrê Kurdistanê ne. Lê belê em dikarin bejin ku li Başûrê Kurdistanê gelekî kêm bûye. Heta em dikarin bejin li gelek bajaran nemaye. Weke Meclîsa Bilind a Jinan me bi UNICEF'ê re bernameyek daye destpêkirin. Sedemên sûnetkirina jinan çine? Yên hatine sûnetkirin rastî çi hatine? Em li ser vê meseleye lêkolînan amade dikin. Emê raportan amade bikin. Bernameya me dest pê kiriye. Em di wê baweriyê de ne ku heta çend salan ewê ev mesele jî çareser bibe û jinên Başûrê Kurdistanê ji ber fişara ayînan rizgar bibin.


**Bi şerê DAIŞ'ê re karesteke mezin bi ser xelkê Şengalê de hat? Bi hezaran jin û keçên êzdî ji hêla DAIŞ'ê ve hatin revandin. Pêşmergeyan gelek jin azadkirin. Her wiha hîn jî gelek jin û keç di destê wan de ne. Rewanşînasiya jinên azadbûyî çawa ye? Ji bo tedawiya wan niha çi kar tê kirin?**

Mixabin jinên me yên Şengalê, xelkê me yê Şengalê rastî êrîşeke bi vî rengî hatin. Li gor zanyariyan zêdetir ji 6 hezar keç û jin di destê DAIŞ'ê de bûn. Gelek ji wan hatine rizgarkirin. Dezgehên emnî ji bo ewlehiyê eşkere nake ka çend jin dîl mane. Yan jî heta niha çend ji wan hatine rizgarkirin. Pêdawîstiya wan keç û jinên me bi alîkariya tendurîstî, komeleyî, rewanşînasî heye. DAIŞ'ê bi êrîşa ser Şengalê re metirsî xist nav cemiyeta jinên Başûrê Kurdistanê. Li gel dezgehên navdewletî peywendiyên me henin û ji bo tedawiya wan jinan heta niha çi ji destê me hat me kir. Nûnera me ya Meclîsa Bilind a Jinan li gel rayedarên Elmanya'yê kom bû û gelek jin niha li Elmanya'yê tên tedawîkirin. Li hêla din me konferans jî bi rêvebirin da ku em karibin çareseriyekê ji avadankirina Şengalê re peyda bikin û xelkê Şengalê vegere cih û warên xwe. Li hêla din li ser wê meseleya rizgarkirina jinan kar berdewam dike û em bi hêvî ne ku di demeke kurt de hemû jin û keç azad bibin.

Li gor biryarên NY'yê di şer û pevçûnan de divê jin û zarok ji ber êrîşan bêne parastin. Pir mixabin jin û zarok di şer de dibin sotemenî û çi dibe bi wan dibe. Ew di nava şer de cih nagirin, ew ne terefên şer in lê bele ew dibin sotemenî. Her wiha me gelek konferans û civîn birêvebirin da ku em jinan ji ber êrîşên terorî biparêzin. Gelek hewldanên me heta niha çêbûne û ewê berdewam bikin. Hûn jî dizanin zêdetir ji 2 mîlyon aware niha li Başûrê Kurdistanê ne. Hikûmeta Bexda'yê mûçeya me naşîne. Li gel vê yekê jî em kare xwe didomînin.

**Tiştekî din jî heye ku niha Herêma Kurdistanê di proseya serbixwebûnê de ye. Erka jinên Başûrê Kurdistanê di vê proseyê de çi ye? Jin beşdarî vê proseyê bûne an na?**

Li her çar parçeyên Kurdistanê jinên kurd erka xwe bi cih anîne. Li gel Pêşmergeyen, li gel Gerîllayan bi erka xwe ve rabûne. Li sengerên şer li gel Pêşmerge û Gerîllayan li hember dijmin şer kirine. Di dirêjahiya dîroka azadiya Kurdistanê de jî karesat bi ser jinên kurd de hatine. Li Helebçe'yê li Dersîmê îro li Kobanê û li Şengalê jinên kurd tûşî gelek êş û azaran bûne. Xewna jina kurd ew e ku dewleta Kurdistanê bibînin. Dema wê hatiye ku Kurdistan serbixwe be û xizmetgozariyê ji kurdan re bike. Em amadene di vê proseyê de cih bigrin. Di referandûmê de biryara xwe bidin. Divê kurd êdî li ser xaka xwe bi azadî bijîn. Divê perçema Kurdistanê jî di nava alên cihanê de cihê xwe bigre.





## Emel Celal kî ye?

Emel Celal ji bajarê Silêmaniyê ye û demeke dirêj e li ser parastina mafê jinan, tûndiya li ser jinan kar dike. Li gel çend pirtûkên li ser jinan gelek makale belavkirine û niha Endama Meclîsa Bilind a Jinan e. Celal beşdarî gelek konferansan bûye û li ser mafê jinan gelek gotar belavkiriye.

# SONQOR



Sonqor wargeha jiyana toreyî ye. Li vê deverê teknolojî hîn jî pîşeyên kevnarê ji holê ranekiriye. Necarî ku gelek lazmatiyên însanan dibersivîne, li bajêr yek ji pîşeyên girîng e. Necarên ku ji bavê xwe ev kar dewrgirtiye û di nav text û daran de mezin bûye, ji derî û paceyan heta qefes û mobilyayan çêdikin. Ew di karê nxwe de darên Zagrosan yên wek spîndar, gûz û çinaran bikartîne.

**Welat Baz**

Sonqora bajarê Rojhilat di nav çiyayên şîrspî de xemilandî ye. Ew der banîya Çiyayê Textî Rustem, quntara Çiyayê Dalaxanî, hêlîna qewmê çiya ye. Sonqor li gor pergala rêvebiriya Dewleta Îranê bajarekî eyaleta Kermanşa ye. Bi Sonqor ve girêdayî gelek xopan û gund hene. Bajêr li ser sînorê eyaleta Kermanşa, di navbera eyaletên Kurdistan û Hamadanê de cîh digre. Cîranên bajêr li bakûr Sine, li başûr Kengawer û Sahne, li rojhilat Çenar û Aşadabad û li rojava jî Kermanşa ye.

**Çiya**

Bajarê Sonqor li keviya rêzeçiyayên Zagrosan hatiye avakirin. Sonqor di navbera çiyayên ji rêzexelekên Zagrosan; Dalaxanî, Kemerê Zerd, Suheyl, Hezarxanî, Xwarû Jarû, Gewr Qela, Textî Rustem û Melemas de cîh digre. Bilindahiyan van çiyayan li seriya 2 hezar metreyî ne. Hin girên van çiyayan digîjin 3 hezar metreyî. Sonqor ji ber ku di navbera çiyayan de hatiye avakirin, devereke bilind e. Berzahiya bajêr ji deryayê 1.700 metre ye. Ji sedemê bilindahiya heremê klîmaya bajêr zivistanan sar û havînan jî hênik e. Derdora bajêr salê 8 meh di bin berf û baranê de ye. Çiyayên bajêr heta dawiya meha Hazîranê jî di bin kirasê berfê yê spî de dimîne.

**Erdnîgar**

Firehiya xaka bajêr 2 hezar û 77 kîlometre çargoşe ye. Çemê sereke ku xaka Sonqor av dide, Gawerû û Senqor Çay e. Herwiha li çiyayên derdora bajêr gelek av û rûbarên çikole ji hene ku erdîma bajêr avdidin. Di aboriya Sonqorê de kîşewerzî û di kîşewerziya bajêr de jî gulberoj cîhekî girîng digrin. Keviyên Zagrosan ji bo gulberojan devereke destdar e. Devrûbera Zagrosan bi zewiyên gulberojan xemilandine. Dendikên gulberojan bi taybetî di çêkirina rûnê xwarinê de tê bikaranîn. Ji ber vê taybetiya xwe gulberoj wek nebatekî endustriyel tê naskirin û di hemû bazara Îranê de tê firotan.

Kîşewerzên Sonqorî ku ji mêjve bi gulberojdanînê re eleqedar in. Şêniya bajêr ji sedî 70 şêniya Sonqor li gundan dijîn û bi giştî bi kiştûkal û ajaldariyê re mijûlin. Ji ber ku erdnîgara heremê bixêrûbêr e, li devere hemû cûre fêkî û sebze tên çandin. Ji bilî nebatên wek genim û ceh, misir, çewender yanê kundir, kartol û lobiya tê çandin. Berhemên xaka Sonqor li bazara bajarên cîran jî tên firotan. Li heremê ajaldarî jî pêşketiye û gelek cûre heywan tên xwedîkirin. Bazirganiya goşt û lawirên jîndar û berhemên ajaldariyê jî di aboriya bajêr de cîhekî girîng digre.

**Şenî**

Şêniya nav bajarê Senqor nêzî 75 hezarî ye. Li gund û xopanên bi Senqor ve girêdayî nifûsa bajêr digîje nêzî 170 hezarî. Ji nîsbeta şêniya heremê 30 ji 100î li bajêr dijîn. Şêniya bajêr bi giştî kurd in. Sonqor wek bajarên din yê Kermanşa di warê baweriyên pîroz de deverêke pirreng e.

Kurdên nav bajêr piranî Şiî ne. Li bajar û gundên eyaletê, ji baweriya kurdan Ehlî Heqî jî hene.

Sonqor di warê komên etnîkî de jî cîhekî dewlemend e. Li bajêr gelek zaravayên kurdî û gelek devokên van zaravayan tê axaftin. Devoka sereke kermanşayî ye. Kurdên Sonqorî diyalektên kelhorî, lorî, goranî û soranî diaxifin û li heremê têkelê hevûdû kirine.

**Nav**

Çîroka navê bajêr tevlîhev e. Li gor yek ji van çîrokan; di dema desthilatiya Selçûqiyan de çend hukumdarên heremê bi navê Sonqor li bajêr desthilatî kirine. Ji ber vê yekê jî navê wan li bajêr bûye. Herwiha heman tişt ji bo hukumdarekî Mongolî jî tê gotin. Ji bilî Sonqor gelê heremê bajarê xwe wek Sungor an kî Senqorê Kulyayî jî binavdike. Li heremê Eşîra Kulyayan dijî û di dema Elî Xanê Qaçar de çend kes ji vê eşîrê li bajêr hatine sêdarê kirin. Ji bo bîranîna qurbaniyên sêdarê, xelqê heremê bajarê xwe wek Sonqorê Kulyayî binavkirine.

**Gorî Sonqor**

Li bajêr tirbeya li ser girekî nêzî bajêr hatiye danîn, di nav gel de wek Gorî Sonqor tê binavkirin. Li gor hin riwayetan ew tirbe gora desthilatdarê bajêr bûye. Li gor hin riwayetên din jî ev gor yê serdarî Hezretî Elî, Malikî Eşter bûye. Ji ber vê riwayetê jî ev gor ji alî hin kesan wek 'Gorî Malikî Eşter' jî tê naskirin. Tirbeya ku li ser Tepeyî Malik hatiye çêkirin, di şeklê gumbetekî de ye. Tirbe li ser bingeheke heştgoşe hatiye danîn. Derdora Gorî Senqor û Tepey Malik hatiye çêkirin û hertim gelek mêvanên tirbê hene.

**Sûk**

Sûka Sengorê wek panayirekî ye. Li kolanên bajêr li aliyekî tîcaret, li aliyekî ziyaret, li aliyekî muhabet di nav hev de heta derengê şevê dajo. Li serê kolanekî mirovekî balkêş, hin lawirên nav qefesê dide reqisandin û bi dehan kesî komî ser sîrka xwe ya biçûk dike. Sonqorî bi baldarî li ser serê vî mirov û ajalên wî kombûne û meharetê wan temaşe dikin. Li kolanekî din kebabfiroşekî qelebalixa birçî kiriye dorê û goştê pijnadî yê pez di nav nanê sêlê de pêşkeşî wan dike. Li kêleka fêkîfiroşan felafîlfiroşê sûkê dezgeha xwe vekiriye. Hin kolanên bajêr jî wek sûkeke servekiriye. Kesê ku tiştekî vî yê firotanê hebe dikeve nav qelebalixê û di demekî kin de bi dehan kesên meraqdar li ser serê xwe kom dike. Pîrekalên golpaldûz gopalên ku çêkirine nîşanî pîrekalên din didin. Gopalên ji dara gûze bala qelebalixê dikşîne.

Li sûkê mirov rastî çendîn mirovên balkêş dibe. Bazirganekî din malê ku li pişt qamyona xwe daniye li kêleka caddê danîye û bi muşteriyan re bazarê dike. Ev xirecira kolanan heta tariya şevê didome. Songqorî roja din kolanenen ku valakirine careke din dagir dikin.

Mêvanxaneyî Textî Cemşîd yek ji cîhên ku birçiyên Sonqorê têr dike ye. Restoran xwarinên heremî çêdike. Bi taybetî xwarinên wek kebab û birinca basmatî pisporiya aşpêjê restoranê ye.


Li Sonqor bi bilî sûka kolanan bazarên mezin jî hene. Li bajêr sûka sergirtî ya kevnare ku hîn jî di bazirganiya bajêr de cîhekî girîng digre, yek ji deverên sereke ye. Di vê bazarê de bi taybetî de dikkanên xwarin û vexwarinê û lîbasfiroş bîcîh bûne.

Li bajêr çend pasajên nûjen jî hene ku di salên dawîn de hatine çêkirin. Di van pasajan de zêdetir mal û lazmatiyên di bihayê de giran û di barkirinê de sivik tên firotin. Bi taybetî pasajî Îmam rojanê bi sedan kesî dike mêvan. Li pasajan zêdetir dikkanên elektronîkfiroşan kombûne.

Esnafên pasajê mobilya midbexan jî difroşin. Mobîlyadûuzên Sonqorê, malên mînak di dikkana xwe de pîşandidin. Di çêkirina mobîlyayan de darên Kurdistanê tên bikaranîn. Perçefiroşên pasajê ku ji vebûna pasajê ve vî karî dikin, dibêjin gelek ji Sonqoriyan lîbasên xwe ji perçeyên ku ew difroşe çêkirine. Perçeyên qumaş ku ji Kermanşa, Tebrîz û Tahranê tên, bi taybetî ji bo xiyatan tên firotan.

Xiyatên Sonqorî bi taybetî lîbasên jina didrûn. Ew hemû cûre û mode cilan kare bidrû. Li gor hostayê xiyat modelên ku zêdetir ji alî jinan tên dirûtin, Sineyî û Sonqorî ne. Hosta modelên kurdî û farsî jî çêdike. Lîbasên ku ew ji qumaşên rengarend didrû wek tabloyên cîwanin. Dirûtina her cilekî bi seatan dajo û ziravkariyeke giranbiha ye. Xiyat zêdetir li ser sîparîşan dixebitin. Li gor hostê rojane 7 ta 8 cilan karin bidrûn. Xiyatî wek zirawkarî li Sonqor yek ji pîşeyên zîinde ye. Li bajêr hîn jî gelek kes kincên kurdî yên gelêrî lixwe dikin.

Ji ber bayixdana kincên Kurdî xiyatên sûka bajêr jî bêkar namînin û pişeya ku yek ji nirxên netewî yên Kurda dide jiyandin li ser piya dimîne. Ji ber vê yekê xiyatên ku









kincên gelêrî didrûn wek hunermendên netewî jî tên naskirin.

Rengdûzî li Kurdistanê wek pîşeyeke kevnare û naskiriye. Di demên dawîn de heta ku sektora konfeksiyonê geş nebûbî jî, li her bajarekî çend rengdûzan kardikirin. Niha kesên xizan ku kincên xwe ji bo nûhkirinê boyaxdikin an jî hin berhemên destekariyê ku tên boyaxkirin vê pîşeyê liser piya dihêlin. Li gor hostayên rengdûz di demên berê de hemû boyaxa wan xezayî bû û ji koka dara derdixistin. Piştî ku boyaxên kîmyewî derketine karê wan jî gelek hêsan bûye.

Yek ji pîşeyên toreyîi li Sonqor lafdûzî ye. Çend dikkanên lafduziyê li bajêr li kolanekî komî serhevûdû bûne. Sonqorî wek destekariyên din qîmeta lihêv, doşek û balîvên ku ji destê hostayan derdikevin, dizanin. Lafdûzên bajêr ku ji mêj ve vî karî dikin, ji karê xwe memnûn in û dilxweşî behsa pîşeya xwe dikin.

Ahengerên bajêr li ber korika germ mezin dibin. Hesingerî yanê ahnegerî li sûka Sonqorê yek ji pîşeyên kevnare ye ku hîn jî gelek pêdiviyan dibersivîne. Ji ber ku li bajêr kîşewerzî û jiyana gundayetî didome, ahenger jî bi taybetî ji bo lazmatiyê wan dixebitin. Hosta ji karê xwe gazinan dikin û ji derameta kêm ya ahengeriyê gazinan dike.

Sonqor wargeha jiyana toreyî ye. Li vê deverê teknolojî hîn jî pîşeyên kevnarê ji holê ranekiriye. Necarî ku gelek lazmatiyên însanan dibersivîne, li bajêr yek ji pîşeyên girîng e. Necarên ku ji bavê xwe ev kar dewrgirtiye û di nav text û daran de mezin bûye, ji derî û paceyan heta qefes û mobilyayan çêdikin. Ew di karê nxwe de darên Zagrosan yên wek spîndar, gûz û çinaran bikartîne.

**Parka serawî**

Serawî Genzela an jî bi navekî din Parkî Kûhestan xoştirin seyrangeha bajêr e. Parkî Kuhestan navê xwe ji ava ku ji lûtkeyên bilind diherike, digre. Seyrangeh li dervayê bajêr li quntara çiya de hatiyê çêkirin. Di mehên havînê û bi taybetî di rojên înê de hemû bajariyên ku dest û lingên wan digrin roja xwe di bin siya darên Genzela de derbasdikin. Li seyrangehê çend kaniyên xweş û piraw hene. Ji sakinên Sonqor Hadiyê Sedîq ku dibêje herçî li Sonqor bûye hemû rojên xwe yên înê li parkî Kûhestan derbaskiriye. Nav seyrangehê bi peykerên lawirên cûrbecûr hatiye xemilandin. Ev peyker bi taybetî bala zarokan dikşînin. Ji zaraokên Sonqorê Arifê Sirûşt ku di bin siya darên vê parkê de mezin bûye behsa Genzelî Serawê dike.

Sonqorî di mehên biharê de ku paqijiya malan dikin, xaliyên xwe yên Kermanşayî jî li ber ava Genzele dişon. Bi vî awayî ser girên derdorê wek cîhê pîşandana xaliyan tê xuyakirin. Ji bilî Genzelî Serawe, Şiwenî Hesenawa jî yek ji cîhê din yê geşta Sonqoriya ye.



www.arsivakurdi.org

# “Birayîya hezar serrane”





Nadire Güntaş Aldatmaz

**Musebîbê 6-7 êlule ancî dewlete û çapemenîya xo bîye. O wext rojnameya Hürriyete manşetanê xo de nuştêne ke rûmê Estemolî rûmanê Qibrisî rê ardim kenê û rûmê Qibrisî kî tirkanê ê cayan rê zulm kenê. Bi na propaganda şaro exmax (Her ca de grubê nîyanenî estê. Nê grubî ekserîyet feqîr ê, cahîl ê û wijdanê xo kor o.) kewt be rayan eynî sey ewruyî.**



Şerê qilêrinî reyna dest pêkerd. Reyna domanî yenê kiştene ha 20 serrên ha des aşmên ferq nêkeno. Cinî, camêrdî, damanî... Kamcî şer, kamcî pêrodayîş yan kî kamci dewa merdena nînan kena meşru. Kam şîkîno cewabê dayîkanê nînan, mayanê nînan bido. Kam şîkîno qalê dewaya xoya heqe bikero, verê nê meyîtan de. Erd de ke meyît bî heme dewayî neheq ê. Çike dewaya tewr heqe, tewr meşru ye a ke seba ciwîyayîşê însanan a, a ya. Orte de ke meyît esto manayê qet tebayî çin o. Heme dewayê heqî, heme qiseyê rindekî wexto ke gonî perayê ci benê qilêrinî.

Dewaya kurdan tabî ke heq a. Tarîxê kurdan bi neheqîya dewletan pirr o. Kurdî tim verê zulmê dewletan de bîyê mexdur, tim tena mendê. “Birayîya hezar serrane” zurade girs a. Her kes zaneno ke na “birayîye” de tim hepis, surgin û qirkerdişî kewtê bara kurdan. Hereketê Şex Saîdî ra be heta qirkerdişê Dêrsimî çend rey nê şarî qirkerdişî dîyê. Dêrsim ra tepîya Çorum, Meraş û raya peyêne kî Sêwaz de Madimak yanî heta nika ma xeyrê na “birayînî” nêdîyo. Birayê ma bi ziwanê xoyê rindekî qisey kenê, domananê xo bi ziwanê xo name kenê, dewlete de cayanê tewr başan de bi nameyê xo kar kenê û cayanê tewr başan de ciwîyenê. Îdareyê dewlete destê înan der o. Yê ma çend hezar merdim merd ke ma hîna şîkîme qalê ziwanê xo bikerîme. Birayîna nîyanene wa binê erdî kewo.

Nika goreyê yasa gerek çend wezîrê HDPyî kî îdareyê dewlete de bibê. Yanî hukmatê weçînitişî de bîyayîşê înan mecburî yo. Hukmatê ma se kerd? Nê her di wezîrî cayanê wînasîyan de kerdî wezîfedar ke kombîyayîşanê înan de ca megîrê û siranê înan memusê, qiseykerdişê înan ra xeberdar mebê. Wezîrê bînî (birayê ma) ke çik qisey kenê, gerek wezîrê HDPyî nêzanê. Derhal tayînî dayî vindarnayene ke nêbo wezîrê HDPyî kesî bigîrê kar, yan kî tayînê yew kesî bivirazê.

Îşte birayîna ma nîyar a. Tim kî nîya bîya. No hal eynî wext de seba elewîyan, seba xirîstîyanan û seba wayiranê fikranê bînan kî nîyar o. Eke winî yo, eke dewaya kurdan û yê mexduranê bînan heq a, çitur verê na neheqîye de vinderîme. Ez emîna ke aqilê her kesî kî yê mi ra zêder o senik nîyo. Her kes zaneno ke bi kiştiş, bi merdene teba nêbeno. Teba bibo kî kes bi no tore mesud nêbeno. Gonî ke pernayê nan, o nan nêwerîno.

Ma zanenîme ke awanîya na dewlete gonîya şarî ser o bîya. Toreyê xo nîyar o. Ê kişenê, bi no kiştiş kî xo goynenê. Nê rojanê peyênan de di hezar kesî kiştê, winî vanê. Di hezar kes! Merdimî ke qalê kiştena merdiman kerd hende bi keyîf qal keno! Nê di hezar kesî kotî ra amey? Mayê nînan, wa û birayê nînan qet çin ê! Yanî merdena nînan qet dej nêdana kesî! Wijdan lazim o! Rast kî wijdan lazim o. Ez emîna ke tarîxê merdimîye nameyê mazluman rîpelanê xo yê zerrênan de nuseno. Ê zaliman kî orteyê gimara xo de verdano.

Çend serrî yo veng danê ke ê koyan şer ca verdê û bi sîyaset heq û huqukê xo bîyarê ca. No veng verê cû goşanê mayan rê şî war. Çike her di hetan de kî goşê mayan vengê înan de bî ke xeberade xeyre bêro. Dima heme şarî destêk da be nê vengî. Êdî ne o het ra ne kî no het ra xebera sîyaye mayan rê nêameyêne. Dima se bî? Na dewlete de kayî zaf ê. Aqilê ma nêşono ser. Heme çîyê rindî ca verdayî û reyna her cayê welatî de, serê her kuçeyî de mergî fetelîno. Azraîlî xo pîşto têra, sereyê xo peyê her kuçeyî ra vejeno.

Şarê tirkan (Na çekuye seba nê şarî çekuyade rasta yan nîya ez emîn nîya. Çike nê kesê ke galimê serê şarê kurdan kenê tirkî kî nîyê. Nê însanî kî nîyê. Merdim nêzaneno ke nînan çitur name bikero.) bîyo har. Çitur ke 6-7 êlule de, yew şewe de keye û dukanê şarê xiristîyanan talan kerd û ci ra tayê kî kiştî ancî ê zemanan ra vêrenîme ra.

Musebîbê 6-7 êlule ancî dewlete û çapemenîya xo bîye. O wext rojnameya Hürriyete manşetanê xo de nuştêne ke rûmê Estemolî rûmanê Qibrisî rê ardim kenê û rûmê Qibrisî kî tirkanê ê cayan rê zulm kenê. Bi na propaganda şaro exmax (Her ca de grubê nîyanenî estê. Nê grubî ekserîyet feqîr ê, cahîl ê û wijdanê xo kor o.) kewt be rayan eynî sey ewruyî.

Ewru ancî reîsîcumhur qisey keno, serekwezîr qisey keno rojnameyê înan (Zêdeyê rojname û televîzyonan sey vengê îqtîdarî veng vejenê.) vengê înan vejenê. Vanê HDP partîyê terorîstan o. Şaro ke rayê xo do be HDPyî demek o kî terorîst o. Coka şar beno hedefê nê nîjadperestan. Yanî şarê tirkan ra taye grubî bixo yan kî xosero nîjadperestîye nêkenê. Bi ardim û teşwiqê dewlete no teror pêyda beno. Şaro bîn, şaro ke zêde yo, o kî vengê xo nêvejeno. Ma hîssîyatê şarê tirkan nêzanenîme. Gelo nê “birayîna hezar serrêne” rê wayîr vejînê yan kî çîyo henên çin o û qet kî çin bî.

Eke zêdeyê şarê tirkan vengê xo nêvejo û na nîjadperestîye qebul biko hîna zaf kes mireno, canê zaf kesî dejeno. No dej çiqas ke zêdîya şar yewbinî ra hende kewno dûrî. Dişmenayînî ke kewte orte û her roj dahîna zêdîye rayê agêrayîşî nêmanenê. Her di hetan rê yew raye manena, a kî raya cerabîyayen a. Ê ke yewbinî rê dişmen ê, ê ke yebinî ra hes nêkenê, ê ke her roj yewbinî ra merdim kişenê mecbur nîyê ke pîya bivindê, cîya bîyayene, cerabîyayene belî kî raya tewr rast a.

Ti ke sîyasetê kurdan rê ca nêverdana, ti ke sîyasetkaran ruşnena hepisxane, ti ke şarê xo verê kurdan de tiz kena ke wa pirodê, ti ke birayînî ra tena hukmê xo fam kena, birayîna to ke tena bêvengîya kurdan ser o ya, tehammulê to ke ziwanê kurdan rê, kincanê kurdan rê bîle çin o qusir de nîyamede kurdî êdî ê ke verê simşerê şima de vileyê xo




Kürd Teavün ve Terakkî Cemiyeti:

# Destpêka hevwelatiya kurd û tirkan!

Evindar Tekin

Di despêka Sedsala 20’an de di nav sînorên osmaniyan de tevgerînên girîng rû didin û piştî ragihandina Meşrûtiyeta II. gelek komele ava dibin. Yek ji van komeleyan jî ‘Kürd Teavün ve Terakkî Cemiyeti’ ye ku di 19’ê Îlona 1908’an de ji alî rewşenbîr û kesayetên grîng ên wek; Seyîd Ebdilqadir, Babanzade Îsmaîl Hakkî, Seîdê Kurdî, Mewlanzade Rifat, Emîn Elî Bedirxan û hin kesên din ve tê damezirandin e. Bi hilkefta salvegera damezirandina vê komeleyê, Zimanzan û Dîroknas Malmîsanij, li ser girîngî, xebat û rola wê û rojnameya wê, agahiyên xwe bi me re parve kir.



### ‘Armanc piştgiriya Meşrûtiyetê bû’

Malmîsanij di derbarê serpêhatiya damezirandina vê komeleyê de da zanîn ku beriya ragihadina Meşrûtiyetê gelek rewşenbîr hatine nefîkirin û piştî ku Meşrûtiyeta II. hatiye ragihandin ew jî li Stenbolê civiyane, damezirînerên vê komeleyê ên wekî Seyîd Evdilqadir, Babanzade Îsmaîl Hakki, Seîdê Kurdî, Cemîl Asena, Mewlanzade Rifat, Emîn Elî Bedirxan û hwd. di nav bizava Îttîhad û Terakkiyê de bûne; Lewre vê bizavê, berî ku hikûmetê bi dest bixe siyaseta azadîxwaz û pêşverû dimeşandiye û gelek rewşenbîrên kurd, ermen û derûdorên din tê de xebatên li hemberî Siltan Evdilhemîdê despot dimeşandine. Malmîsanij bale kişand ku pêşengiyên komeleyên ku piştî Meşrûtiyeta II. hatin damezirandin komeleyên kurd û arnawûtan bûne ku Kürd Teavün ve Terakkî Cemiyeti jî yek ji wan e. Malmîsanij di derbarê armanca vê komeleyê de wisa axivî, “Wê demê Qanûnî Esasî girîng bû lewre li hemberî kiryarên kêfî û despotîk ên Siltan Evdilhemîd azadiyek dixist pêş. Komeleya Kürd Teavün ve Terakkî Cemiyeti jî bi armanca parastina Meşrûtiyet û Qanûnî Esasî û danasîna wê di nav gelê kurd de digel vê jî qadên wekî perwerdehî, danûstandin, sanayî û ziraet de pêşveçûna civakê hate damezirandin. Di belavoka di rojnameyê de weşiyayî de dibêje tu milet ji miletekî din serdest nîn e.”

Malmîsanij destnîşan kir ku daxwazên rewşenbîrên kurd ên wê demê ji çerçoveya Dewleta Osmanî dernediketine, bes ji bo Kurdistanê daxwazên maqûl ên wekî mafên mirovan, pêşveçûna civaka kurd, bextewariya kurdan ku ev gotar gelekî nezelal e û hwd. bûne. Her wiha Malmîsanij destnîşan kir ku neteweperweriya vê komeleyê neteweperweriyeke çandî bûye, siyasî nîn bûye lê girîngiya wê ev e ku yekem car kurdan rêxistineke modern û legal ava kiriye, heta wê demê bi wateyeke modern rêxistina kurdan tune bûye, weke jêderkekê fikr û ramanên û kesayetên kurdewar jê derketine û di nav bizavên bêyî de cihên xwe girtine, her wiha yekem car e ku rojnameyek ji rêxistinekê derketiye lewre rojnameyên beriya vê giş ên takekesan in. Malmîsanij da zanîn ku wê demê belavokeke hevpar a rêxistinên legal ên wekî Osmanlı Îttîhad ve Terakkî Cemiyeti, Osmanlı Ahrar Fırkası, Ermeni Taşnaksutyun, Rum Cemiyeti heye ku tê de navê Kürd Teavün ve Terakkî Cemiyeti ji derbas dibe, ev tê vê wateyê ku ev komele, komeleyeke legal bûye.

### ‘Divê endamên lijneyê kurdî bizanibin!’

Herwiha Malmîsanij bale kişand ser taybetmendiyên vê komeleyê û got ku mijarin di rojnameyê de hatine bilêvkirin hene ku hêj aktuel in, bo nimûne balkêş e ku behsa damezirandina bankayeke kurdî kirine ku îro jî hêj nehatiye bîra kurdekî. Her wiha di destûrnameya wan de fikra avakirina dibistanan hebûye, li ser wêje û rêzimanê sekinîne û ji bo hêsankirina xwendin û nivîsandina bi kurdî behsa rêzimanekê û bi qewlê wan ve ‘ferhengeke mukemmel’ kirine. Her wiha Malmîsanij bale kişand ku gotine ên ku dixwazin bibin endamên lijneya rêvebirinê, divê di serî de bikaribin bi kurdî û tirkî binivîsin û bixwînin, ên kurdî nizanin, li şûna wî divê zimanekî biyanî bizanibe û wiha domand, “Em dinêrin di tu bernameya rêxistinên siyasî de kurdî bivênevê nîn e, gelek babetên vê komeleyê ên wekî rêziman, ferheng, dibistan, banka û hwd. hêj aktuel in. Malmîsanij got ku wê demê li Stenbolê 500 kes beşdarî kongreya vê komeleyê bûne ku ev yek jî piş balkêş e.”

### Komele û mijara têkiliya kurd û ermenan

Yek ji girîngtirîn mijarên ku di rojnameya Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi de tên kirpandin tekiliya kurd û ermenan e ku gelek nivîsar li serê hatine nivîsîn. Malmîsanij bi peywenda diyardeyên dîrokî ev mijar wiha nirxand: Beriya jenosîda ermenan a 1915’an, tadeya li ser gelê ermenî hatibû destpêkirin. Gelê ermen beriya kurdan birêxistinî bûn û tevgera wan beriya kurdan dest pê kiribû û dewletên ewropayî jî piştgiriya wan dikir. Wexta ku ji dewleta osmanî hesaba tadeya li ser wan dipirsî, dewletê jî kurd sûcdar dikirin û digotin ên ku zilmê li ermenan dikin ne em in, kurd in. Lê na, dewletê ev organîze dikir û bi gotegotên wekî ‘ermenan dixwazin li welatê we dewletek ava bike, ew ê her tiştên we ji we bistînin’ kurd tehrîk dikirin.” Malmîsanij destnîşan kir ku beriya vê komeleyê û rojnameyê jî ev mijar hatiye pêşxistin. Bo nimûne belavokeke Evdirehman Bedirxanî a bi navê “Kürdistan Kıyamı” (Serhildana Kurdistanê) heye ku naveroke wê rasterast, ji serî heta dawî mijara ermenan e. Malmîsanij got ku di vê rojnameyê de jî li ser aramî û aştiya di navbera kurd û ermenan de, ji bo hişyarkirina kurdan li ser vê mijarê gelek nivîsar hene û armanca wan jiholêrakirina vê sûcdarkirin e.




### Bi rêya rojnameyê têkiliya bi kurdan re

Weke ku tê zanîn rojnameya vê komeleyê a bi navê Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesî, ji bajarên Kurdistanê ên wekî Bedlîs Mûş, Amed, Wan û her wiha Bexdayê re jî hatiye şandin. Malmîsanij got ku endamên komeleyê gelekî zêde xuya dikin, sedema wê jî ev e ku wê demê ji ber ku kurd digel eşîrên xwe tevdigeriyane bi serekên xwe kom bi kom tevlî komeleyê bûne, ne ku kurd bi yeko yeko tevlî bûne, bo nimûne serokê şaxa Diyarbekirê Suphî Efendîyê miftiyê Diyarbekir, li cîhana Îslamê şair û limekî gelekî navdar bû ku navê ‘Allame’ lê kiribûn ku dihat wateya ‘kesê ku her tiştî dizane’. Malmîsanîj Wiha pê de çû, “Kesên xwedî erk û bibandor jî di nav vê komeleyê de hebûn. Wê demê hejmara şaxên Îttîhad û Terakkiyan gelekî kêm bûn li Kurdistanê. Piştî ku Îttîhad û Terakkiyî ev komele girtin, bi zorê kurd kirin endamên xwe, a girîng ev e ku cara pêşî li Kurdistanê kulubek/komeleyek tê vekirin. Her wiha rojnameyê, kurd ji hev haydar dikir, bo nimûne Şêx Seîdê bavê Şêx Mehmûd Berzincî li Mûsilê tê kuştin, rojname li ser wê sekiniye û lê xwedî derketiye. Avantaja hebûna şaxan jî ev e ku rojnameyên wan belav bûne. Wek nimûne; Li ser rojnameya Kurdistanê dibêjin “me 2 hezar rojname şandine” û “me ji wîlayetan re belaş dişand”

### Daxwaza wan a ji bo xurtkirina rêveberiyên herêmî !

Malmîsanij di dawiyê de jî bale kişand ser daxwaza wan a xurtkirina rêvebirinên herêmî û got ku wê demê ekoleke bi navê ‘Adem-i Merkeziyet’ ango tunebûna navendîbûnê hebûye. Prens Sabahaddîn pêşengiya wê dikiriye, rewşenbîrên kurd jî ew diparastine lewre nîsbî be jî mafên pêkhateyên herêmî û gelên bindest dihatine parastin û hêzên herêmî xurtir dikirine û yek ji wan rewşenbîran jî Evdilah Cewdet bû.

Dr. Mihemed Sadiq Şerefkendî:

# 'Xelefê Qazî Mihemed û Dr. Qasîmlo'

Evîndar Amed

Di dîroka rizgariya gelên bindest de yek ji girîngtirîn hêmanan kesayetên ku di meşa ber bi azadbûnê de pêşengiya wan gelan dikin in. Dr. Mihemed Sadıq Şerefkendî jî ji bo gelê kurd ew kes e ku weneyê vala yê gelê kurd bi rengên helbestî dinexşîne. Helbestkar, nûser û wergêr e, lê di heman demê de tekoşer û siyasetmedarekî dilsoz û şareza ye. Dr. Sadiq Şerefkendî ku di sala 1992'yan de Sekreteriya Giştî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê li Îranê (PDK-Î) dikir, di 17'ê Îlona heman salê de, li Berlîn'a paytexta Elmanya'yê di restoranta Mykonos de li gel 3 hevalên xwe ji alî sîxurên kujer ên Îtlaata Îranê ve hatibûn kuştin. 17'ê îlonê jî di dîroka Kurdistanê de wek gelek rojên din ên bi xapandin û dolaban serkirdeyekî kurd hatiye kuştin e.

**Birayê Şair Hêjarê niştimanperwer: Dr. Şerefkendî**

Dr. Şerefkendî di sala 1938'an de li gundê Terexe yê Bokanê wek kurekî malbateke welatparêz hatiye dinyayê. Piştî ku bavê wî jiyana xwe ji dest dide, birayê wî helbestvanê navdar Hejar pê re mijûl dibe. Sadiq Şerefkendi ji şarezayî û wêjekariya birayê xwe Hejar pir sûd werdigire û ramanên wî yên jiyanê diguherîne. Li dû vê tîna birayê xwe Dr. Şerefkendî di dibistanan de pir serkeftî dibe û hemû astên xwendinê bi pileyên bilind derbaz dike û di encama xwendina xwe de ji ZanîngehaTehranê lîsansa kîmyayê werdigire. Balkêş e ku dema mamostetiya wî ya li Ûrmiye û Mehabadê, xwendevanên wî yên ku li zanîngehan pir serkeftî dibûn her ku diçû zêde dibûn. Ev yek bala 'Îtlaat'ê ango Dezgeha Sîxûrî ya Rejîma Şah Riza dikişîne û ji ber vê yekê wî mixewtî bajarên wek 'Eraq" û 'Kerec'ê dikin. Di sala 1970'yî de wek alîkarê hînkar ê beşa kîmyayê dest bi kar dike û di sala 1972'an de ji bo doktoraya li ser Kîmyaya Analîtîkê diçe Ewropa û li paytexta Frensa Parîsê xwendina xwe ya pisporî didomîne.

**'Cihê Dr. Qasimlo bi serkeftî dadigire'**

Serokê Komîsyona Leşkerî yê PDK-Î'yê Rustem Cîhangîrî di derbarê çûna Şerefkendî ya Parîsê û xebatên wî de pirsên me bersivand. Cîhangîrî got: "Piştî çûna Parîsê, Dr. Şerefkendî, bi Dr. Evdirehman Qasimlo re dikeve têkiliyê û tevlî xebatên PDK-Î'yê dibe û dibe Nûnerê PDK-Î'yê yê Tahranê û di serkeftina şoreşa gelê Îranê ya sala 1979'an de Dr.Şerefkendî dibe berpirsiyarê partiyê û heta şehadeta Dr. Qasimlo, dibe cihgirê wî. Piştî ku Dr. Qasimlo di sala 1989'an de şehîd dibe Dr. Şerfekendî dibe Sekreterê Giştî yê PDK-Î'yê, cihê Qasimlo bi serkeftî dadigire û heta şehadeta xwe, vê peywirê didomîne."

Cîhangîrî bale kişand ku digel nasnameya wî ya akademîk ku di wî warî de jî pir serkeftî bû, di kesayeta wî de rola sîyasî zêdetir dikeve pêş û wisa got: "Digel şoreşgerî aliyê wî yê zanistî jî hebû. Ew doktorê Kîmyayê bû. Wek mamoste li zanîngaha Tahran û Urmiyeyê û li mektebên Ûrmiye û Mihabadê xebitiye û dewleta Îranê ew sirgûnî başûrê Îranê dikin. Şerefkendî wek hîndekarê kîmyayê xebitî, xizmeteke zêde li medreseyan bi rê ve bir, di dawiyê de tevlî siyasetê bû di warê siyasetê de gelekî serwext bû."

**'Xelefê Qazî Mihemed û Dr. Qasîmlo'**

Berdevkê Polîtburoya PDK-Î yê Hewlêrê Mihemed Salih Qadir jî girîngiya Dr. Şerefkendî anî ziman û got ku di siyaseta kurd a li Îranê de piştî Qazî Mihemmed û Dr. Evdirehman Qasimlo, sêyem kesayetê ku li Rojhilatê Kurdistanê bi navûdeng e Dr. Sadiq Şerefkendî ye, ji ber ku kesayetiyekî akademîk bû, wî li Fransayê PDK-Î nas kiriye tevlî tevgera azadiya Kurdistanê bûye. Qadir da zanîn ku di şert û mercên dema xwe de Şerefkendî ew kes bû ku li Tehranê berpirsê rêxistineke îllegal ango PDK-Î bû û gav bi gav, qonax bi qonax hêjayî û lêhatîbûna wî bandora xwe eşkere dikir. Qadir bale kişand ku ji bilî xebatên siyasî, Şerefkendî xwediyê lêkolînan jî bû û li ser tevgerên serhildêr ên Kurdistanê dîrokçeyek nivîsandiye, her wiha rexneyên wî li ser Sosyalîzma Demokratîk xebitiye.

**Îtlaata Îranê çima ew qetl kir?**

Di 15-17 Îlonê de li Berlîne Enternasyonala Sosyalîst civiyabû û Dr. Şerefkendî jî vexwendiyê wê bû. Şeva 17'ê Îlonê Dr. Şerefkendî bi muxalifên Îranê re li restoranta Mykonos dicive û ji wan re behsa mafên kurdan û otonomiya Kurdistanê dike. wê şevê rastî terorîzma Îranê tê û digel 3 hevalên xwe tê kuştin. Li ser sedema vê operasyona kampax Mihemed Salih Qadir got ku Dr. Şerefkendî ew kes bû ku dikaribû piştî Dr. Qasimlo xebata azadiya Kurdistanê bimeşîne, dewlet ji karîzmaya wî, otorîteya wî, fikrên wî tirsiya lewma ew kuşt û wisa domand: "Li Enternasyonala Sosyalîst, muxalefeta Îranê nîqaş dikir ku divê muxalefeta îranê bi kiryar xebata xwe xurt bike, piştî şerê Îran û Iraqê rawestiya Dr. Şerefkendî êdî hem li rojhilata Kurdistanê hem jî li qada muxalefeta Îranê bûbû siyasetmedarekî karîzma û dixwest bi helwestên hevbeş yekitiya muxalefeta Îranê pêk bîne. PDK-Î jî di warê muxalefeta Îranê de roleke girîng dilîst. Ne tenê Şerefkendî û muxalefeta kurd, di wê terorîzmê de hemû pêkhateyên muxalefeta îranê hedefa dewleta îranê bûn. Lewre yek ji cangoriyên vê terorê jî Îranî bû."


**Serpêhatiya wî ya siyasî**

Dr. Şerefkendî hizra neteweperweriyê ji malbata xwe bi taybetî ji birayê xwe Mamoste Hejar wergirtibû lê piştî çûyîna Fransayê û nasîna PDK-Î yê tevlî qada siyasetê bû. Yekem car di sala 1973an de li Parîsê Dr. Qasimo dît û nêzîkî PDK-Î bû. Di sala 1976an de li zanîngehên Pierre û Marie Curie teza xwe ya doktorayê li ser Kîmyaya Analîtîk nivîsand û vegeriya Kurdistanê. Li Kurdistanê berê wek endamê komîteya navendî pişt re jî wek endamekî polîtburoya partiya xwe hat hilbijartin. Piştî hilweşîna rejîmê PDK-Î xebatên xwe bi eşkere dimeşandin û Şerefkendî di sala 1979an de bû Rajêwkarê Komîteya Navendî û di sala 1980î de kongreyê ew wekî Nendamê Komiteya Navendî hilbijart û berpirsiyariya Tehranê da wî û di heman salê de rêveberiya partiyê ew wexwend Kurdistanê û weke endamê Deftera Siyasî hat hilbijartin û hemû kongreyan de weke endamê Komîteya Navendî jî dihat peywirdarkirin. Di sala 1986an de bû cîgirê Dr. Qasimlo û piştî qetlkirina Qasimlo jî bû Sekreterê Giştî yê PDK-Î û heta şehadetê ev peywir domand. Dr. Şerefkendî di tekoşîna xwe de gelek caran xwe xistiye metirsî û xetereyê, berpirsiyariya ragihandin û çapemenî a partiyê bêtir wî hilgirtiye. Dr. Şerefkendî; mirovekî durist û pak bûye û hemû hêz û temenê xwe ji bo xebatên partiya xwe û têkoşîna Kurdistanê terxan kirî ye. Baweriyeke kûr bi demokrasî û mafên gelên Îranê pê re hebû. Dr. Şerefkendî di jiyana xwe de tu car nebûye siyasetmedarekî li pey berjewendiyên xwe yên takekesî bikeve jixwe ji bilî vêc û berjewendiyên gelê xwe tu qazanc û vêcek taybetî û take kesî jêre girîng nebû.

"Di şert û mercên dema xwe de Şerefkendî ew kes bû ku li Tehranê berpirsê rêxistineke îllegal ango PDK-Î bû û gav bi gav, qonax bi qonax hêjayî û lêhatîbûna wî bandora xwe eşkere dikir. Ji bilî xebatên siyasî, Şerefkendî xwediyê lêkolînan jî bû û li ser tevgerên serhildêr ên Kurdistanê dîrokçeyek nivîsandiye, her wiha rexneyên wî li ser sosyalîzma demokratîk xebitiye."









Mehmet Bayrak:

# Bi pênûsa kurdekî jinên kurd



Siwar Bedirxan

Dema li dirêjahiya dîroka Kurdistanê tê temaşekirin yekser tê dîtin ku dewletên mêtingeh ên Kurdistanê rê li ber pêşketin û geşadana kurdî girtine û gelek bermayîyên dîrokî yên Kurdistanê ji holê rakirine. Her çend dagirker bi rûxandin û jinavbirina kurdan mijûl bin jî çanda qedîm a kurdî, dîroka kurdan, bi berxwedana pêşewayên ziman û dîroknûsên kurd li ser piya maye. Li her çar perçeyên Kurdistanê ronakbîrên kurdan li kelepora kurdan, çand û zimanê kurdî, ayîn û baweriyên kurdî karkirine û ew tomar kirine.

Kurdolog û dîroknaseê kurd Mehmet Bayrak ê ku bi tena serê xwe weke enstîtuyekê kar kiriye jî yek ji wan ronakbîrên kurda ye. Bayrak li gel xebatên li ser bawerî û ayînên cuda, li ser dîroka modern a kurdan, li ser folklor û muzîka kurdan heta niha bi dehan kitêb belavkirine. Bayrak li gel karê lêkolîn û dîroknasiyê weşangeriyê jî dike û heta niha zêdetir ji 100 kitebî jî belav kiriye. Heri dawi Bayrak li ser jinên kurd pirtûkek belav kir. Yanî em dikarin bejin ku Bayrak jî gotina pêşiyên kurd a " Jin heye ji mêran zedeye" li ber çav girtiye û li ser wan jinên kurd ê ku bavûkalan destnîşan kiriye kar kiriye. Pirtûka Mehmet Bayrak a li ser jinên kurd bi navê "Kuşatmayı Yaran Kürt Kadını-Kürt Amazaon Fataraş'tan Gerilla'ya" ji nava Weşanxaneya Özgeyê derketiye.




**Temenekî ji kurdolojiyê re terxankirî**

Beriya ku em dest bi danasîna kitêba Mehmet Bayrak bikin divê em qala serboriya Bayrak a xebatên kurdolojiyê jî bikin. Mehmet Bayrak piştî kutakirina Zankoya Enqerê di salên 1970'yî de dest bi lêkolînan dike. Her wiha Bayrak berê xwe dide bawriyên kevn ê kurdan û li ser baweriyên kurdan ên weke yaresanî, elewîtî, zerdeştî û êzîdîtiye gelek belgeyan berhev dike û wan belav dike. Di gel lêkolînan Bayrak di sala 1988-1989'an de bi navê Özgür Gelecekê kovarekê jî derdixe û di wê kovarê jî de gelek gotar û lêkolîn belav kiriye. Ji ber derxistina kovarê Bayrak gelek caran rastî êrîşan bûye gelek caran hatiye bin çav kirin û du caran hatiye zinadanîkirin. Li gel vê yekê li ser Bayrak 30 doz hatin vekirin û rastî gelek îşkenceyan hat. Li gel van êrîş û serkutiyan jî Bayrak temenê xwe ji lêkolînên kurdolojiyê terxan kir û heta niha zêdetirî 20 pirtûk li ser kurdolojiyê belav kir.

Pirtûka Bayrak a bi navê "Kuşatmayı Yaran Kürt Kadını- Kürt Amazaon Fataraş'tan Gerilla'ya" ji sê beşan pêk tê. Di her beşê jî de berhem bi dabeşî çend serenavên din dibe. Serenavê beşa yekemîn a pirtûkê "Kûrtler'de Savaşçı Kadın Tipi ve Gerillar" e di binê vî serenavî de Bayrak berê xwe dide destan, çîrok, bawerî, edebiyat dîroka kurdan û li şopa jinên kurd digere. Bayrak berê xwe dide dîroka rojavayiyan û di lîteratûra wan jî de li navê jinên kurd digere. Her wiha Bayrak rûpelên dîrokê yek bi yek tev dide û cih dide rola jinên kurd a dîroka kurdan û li ser "Cemiyeta Tealî ya Jinên Kurd" jî û dide eşkere kirin ku çi di destpêka şaristaniyê de û çi jî di serdema modern de jinên kurd di nava civaka kurd bûne xwedî erk.

**Gravûr û belgeyên li ser jinên kurd**

Di serenavê din ê beşa yekem de Mehmet Bayrak li ser şerejina kurd Fataraş rawestiyaye û serenavê beşê jî wiha daniye: "Kırım Savaşı'nda Kürt Amazonu Kara Fatma" di bin vî serenavî jî de Mehmet Bayrak cih dide rola Fataraş a li şerê Osmanî û Rûsan û sedsala 19'an û dikole. Mehmet Bayrak li gel danûstendinên li Fataraş a bi wezîr û nûnerên Osmanî re destanên ku li ser Fataraş hatine nivîsîn jî eşkere dike. li gel vê yekê Bayrak bi xwe jî demekê çûye Mereşê û şopa Fataraş ajotiye û neviyên wê peyda kiriye û bi wan re hevypeyvînek kiriye. Her wiha di vî serenavî de Bayrak ji gelek gravûr, destan û belgeyên li ser Fataraş di vê beşê de bi cih kiriye û şîrove û tehlîla wê serdemê hêsantir kiriye.

Di beşa duyemîn de berhem bi serenava "Kürt Kadın Gerilla Önderleri Anlatıyor" de derdikeve pêşberî xwînerên xwe. Di vî serenavî de Bayrak cih da ye hevpeyvînên ku bi fermandarên jin ê KCK'ê. Besê Hozat, Fatma Adir Dersîm, Sakîne Pîr, Besê Erzîncan, Zîlan Goyî bersiva pirsên Mehmet Bayrak danin û li ser bexwedana Gerîllayên jin rawestiya nin. Her wiha di vê beşê hevpeyvînên bi fermandarên YPG'ê yên Kobanê jî re hatine kirin cih digrin û fermandarên jinên Kobanê li ser berxwedana jinên kurd ê li hember DAIŞ'ê radiwestin.Mehmet Bayrak ji bilî lêkolînên xwe cih daye gelek xebatên hin reweşenbîran kurdan ê li ser mijarê jî û babatên wan jî pirtûk dewlementir kirine. Gotara Mehmed Emîn Zekî Beg û her wiha gotarên Kamûran Bedirxan û Sûreyya Bedirxan ê li ser jinên kurd jî berhem dewlementir kirine rengekî nû dane berhemê. Ji bilî vê yekê jî ji ber ku Mehmet Bayrak heta ku ji destê wî tê ji serçaviyên yekem îstîfade dike û wan serçaviyan eşkere dike berhem ji hêlekê jî rengê bîblîyografiyeke li ser jinên kurd wergirtiye.

**Lêkolîneke li ser hemû jinên Kurdistanê ye**

Beşa sêyam a berhemê jî bi serenava "Doğu ve Batı Literatüründe Kürt Kadını" dest pê dike. Mehmet Bayrak div ê beşê jî de li ser kelepora şerqê û rojava radiweste orf û edet, stran û destan, şîn û şahî hemû bûne mijarên vê serenavê hûn Bayrak ji ser van serenav û hurgiliyan dîmenekî jina kurd nîşanî xwînerên xwe dide. Di vî serenavî de li ser jinên her çar perçeyê Kurdistanê û jinên kurd ê li Kafkasyayê jî hatiye rawestandin û jiyana wan, rola wan a di nava civakê de tevî hurgiliyan hatiye vegotin. Her wiha liberkirina libasên jinan ê cur be cur guherîna wan û bazin û xalxalên jinan jî di vî serenavî cih digrin. Berhem valahiya di warê lêkolînên li ser jinên kurd dadigre û rê li ber xebatên nû vedike. Lewre di her beşê de Bayrak cih daye belge û gravûran û ev yek jî rê li bel lêkolînaran vedike ku li ser wan belge û gravûran rawestin û wan ji nüve şîrove bikin. Li gel vê yekê jî eşkere tê xuyakirin ku ev berhema Mehmet Bayrak jî weke berhemên wî yên din piştî lêhûrbûn û xebatên giran hatiye amadekirin. Di pêşgotinê de jî eşkere dibe ku Bayrak di sala 2002'an de dest bi vê berhemê kiriye û heta 2015'an berhem ji xwîneran re amade bûye.

www.arsivakurd.org



## Yekbûn:
# Ji bo mûzîkê hez û dilsozî divê

Mehmet Emin Kan

Yek ji Muzîkjenên kurd ên Bakurî ku ji kevneşopiya Navenda Çanda Mezopotamyayê(NÇM) gihîştiye û bi şêwaza xwe ya herikbar û stranên xwe yên li şêwaza wî digoncivin, di dilê mûzîkhezên kurd de cih girtiye jî bêguman Yekbûn e. Yekbûnê, bi salan di Koma Çiya de xebatên mûzîkê meşandiye û piştî demek dirêj li Ewropayê bi cih bûye, lê paşê vegeriyaye axa xwe. Yekbûn niha biryar daye ku êdî ew ê li Amedê bijî û xebatên xwe li vî bajarî bimeşîne. Me li ser destpêkirina wê ya mûzîkjeniyê, salên NÇM'ê û Koma Çiya, çûna wê ya Ewropa û biryara vegera wê ya Kurdistanê pirsan jê pirsî û wê bi dilgermî bersiv dan me.

**Piçûka 6 xwişk û bira dest bi mûzîkê dike**

Yekbûn a ku wek gellek jinên xama temenê xwe ji me re negot, her çiqas xwe Mêrdînî bide nasîn jî, li Stenbolê çavên xwe li vê cîhana sosret vekirî ye. Piçûka 6 xwîşk û birayan di sala 1989'an de bi awayekî amatorî dest bi mûzîkê kirî ye. Piştî pêwendbûna bi NÇM'ê re di



damezirandina Koma Çiya de cih girtiye û bi vî awayî noqî nav mûzîkê bûye. Yekbûnê wan salan wiha vegot: "Heta sala 1997'an ez di Koma Çiya de bi şêweyekî çalak beşdarî gelek şev, şahî, konsêrt û organizasyonan bûm. Min li Zanîngeha Marmarayê di Beşa Mamostetiya Muzîkê de, perwerdehiya deng xelas kir. Di sala 2002'yan de bi yekemîn berhema xwe ya solo ya bi navê "Nirwana" derketim pêşberî hezkiriyên xwe. Di vê navberê de tevlî gelek xebatên hunerî bûm. Dîsa bi mûzîk û vokalîstiyê tevlî xebatên rêzefilmên 'Ihlamûrlar Altında', 'Esîr Kalpler', 'Asî' û hin filmên din bûm. Li aliyê din ve min reklam û jenerîkên mûzîkan amade kirin. Min ji bo komên dansê yen muzîkên taybet muzîkan amade kirin. Li gel berhemên min, min di gelek berhemên hûnerî de muzîksazîye kir. Di sala 2007'an de bi duyemîn berhema xwe ya hunerî ya bi navê "Kejê" derketim pêşberî hezkiriyên xwe. Di sala 2013'an de, min dû albûm derxist. Yek jê ji bo zarokan ku bi navê 'Zarok' û yek jê jî bi navê 'Dilop' bi etîketa Vin Production derketin. Îsal jî ez bi stranekê beşdarî albûma ku ji bo bîranîna helbestvan Bro Omerî ku wek xebateke komun ji alî gellek stranbêjên kurd ve û bi çêkeriya Kalan muzikê ve hate amadekirin bûm. Bi tevahî min heta niha 4 albûmên solo derxistine lê di çend projeyan de jî ez bi stranekî beşdar bûne"

**'NÇM navenda hunerê bû'**

Yekbûnê, NÇM'ê ji bo çanda kurd wek navendeke grîng nirxand, da zanin ku NÇM'ê di şertên herî dijwar de jî xebatên baş kirî ye û dom kir: "NÇM, ji bo kurdên ku serê xwe bi hunerê diêşandin navend bû. Ez ji dêstpêka damezrandinê heta 1997'an di NÇM'e de xebitîm. Ev pêvajoyek pir zor bû. Ji bilî dû tembûr û daholekî tu amûrên me tune bûn; lê dîsa jî em beşdarî bernameyan dibûn. Pir caran xwediyên salonan mîkser û mîkrofon nedidan me. Piştî sê salan ûdek ket destê me û ji bo mûzîka me rengîntir bibe min xwe hînî ûd'ê kir. Tembûr, ûd, pîano, rîitm û paşê min dît ku ez di gelek beşan de bi pêş ketime. Min gellek hunermendên hoste dîtin. Dûre ez têgihîştim ku cih an jî dezgeh ne grîng e; Ya grîng dilsozî û daxwaz e. Niha tu têkiliyeke min bi dezgehan re tune lê dîsa jî hewl didim û xwe digihînim"

**'Mûzîka kurd baş nayê lêkolîn'**

Hunermend Yekbûn di berdewamiya axaftina xwe de gazinan kir ku li ser mûzîka kurdî lêkolînên baş nayên kirin û diyar kir ku li gel vê yekê jî ew, kesên ku mûzîka kurdî bi dûbarekirinê rexne dikin napejirîne. Yekbûn got: "Li gor min rexneyên ku li mûzîka kurdî û hunermendan têne kirin ku goya mûzîka kurd û hunermendên wê xwe dubarê dikin pir ne rastin. Ji ber ku li ser mûzîka kurdî lêkolînên baş û zanistî nayêne kirin rexneyên wîsa têne kirin. Li pêşiya mûzîka kurdî gelek astengî hene û li gor mûzîkjenên neteweyên din derfetên me pir kêm in. Di vê rewşê de disa jî gelek berhemên xweş û nexweş jî derdikevin. Divê mirov hinek bi dilpak be. Ger ku mirov hinek lêbikole, mirov dibîne ku li her çar perçeyên Kurdistanê di mûzîkê de xebatên bêhempa û granbûha têne kirin. Wek nimûne; Mirov dikare qala Şivan Perwer, Ciwan Haco û Nîzamettîn Arîç û gellekên din ku kedeke pir mezin dane û di bergîdana wê kedê de serkeftineke mezin bi dest xistine. Ev karên ku hatine kirin karên dîrokî ne û li ba dilê min pir pîroz in"

**Mirov jin be û hunermend be herkes dûr dikeve**

Yekbûnê ji alî cewherî ve mûzîka kurdî nirxand û anî ziman ku mûzîka kurdî mûzîkek resen e, heta niha mûzîkjen negihîştine cewhera wê û ji ber vê yekê hê nehatiye bikaranîn. Yekbûn got: "Lê belê gelê kurd xwedî li çanda xwe derketiye, ew parastiye û berheman gihandine me. Ger ku profesyonelî bi pêş bikeve wê mûzîkjenên kurd di gellek qadan de derkevin pêş" Yekbûnê çûna xwe ya Ewropayê jî wiha vegot: "Mala min berê li Stenbolê bû û paşê ji ber ku hevjînê min nikarîbû bihata wir, ez çûm Almanyayê. Piştî ku me karê burokrasiyê çareser kir em vegeriyan Kurdistanê. Me ji mêj ve ev plan çêkiribû, lê me karî niha bi cîh bînin. Ez berê jî bi rêya bernameyan çûbûm Ewropayê, lê min tu carî jê hez nekir. Ji niha pê ve dixwazim li welatê xwe bijîm. Hêvîdarim ku ez hewceyî kesî nebim û karibim debara xwe bikim. Ji bona xebatên muzîkê kes bawer nake ku şiyana min ji nivîsandina armonî û notayên muzîkê heye. Ku mirov jin be û hunermend be herkes dûr dikeve. Wekî din aranjor li dû hev nabaş dipeyivin da ku ji hunermendan pere werbigirin. Ez qet hez nakim kû mirovan qanî bikim û bêjim ka ez binemûzîka albûma we çêbikim. Lê heke pêşniyaz hebin ezê bi kêfxweşî pişgirî bidim wan"

**Huner di qontrola hizban de ye**

Di dawiya axaftina xwe de Yekbunê angaşt ku li Kurdistanê huner di bin nîrê partiyan de ye, bêyî destûra partiyan hunermend nikarin albûman çêbikin û got: "Bi raya min li Kurdistanê huner di bin nîrê partiyan de ye. Li welatê me her dem şer heye û ji ber vê yekê ger ku hunermend pişta xwe bide partiyan û stranên şer bêjin wê karibin albûmekê derxînin an jî karek din bikin û derkevin pêş û bêne nasîn. Ger ku hunermendekî navdar be, dibe ku hinek şirket albûmên wî derxînin, lê ger ku ne navdar be derxisitina albûman pir zor e û divê ew bi serê xwe albûmên xwe çê bike. Min tenê albûma xwe ya yekem bi derfetên xwe derxist. Albûmên min ên din bi piştgiriya şirket an jî Hikûmeta Herêma Kurdistanê derketin. Ji ber vê yekê ez xwe pir bi şens dibînim. Min beriya dû salan, dû albûm bi hev re derxistin û îsal jî ez bi stranek beşdarî albûma, helbestên Bro Omerî ya bi navê 'Peşk'ê bûm. Ger ku derfet çebibin ez ê hewl bidim ku albûmek derxim. Berdewamiya şer peşkê li mûzîkê jî dixe, lê ez nû hatime Kurdîstanê. Hin xebatên min hene, lê di vê tevlîheviyê de ez bawer nakim ku ez ê dikaribim zêde çalak bibim"